

# OROJA NÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



5  
1984

## NAVEROK

Nameyeñ xwendevanan.....	3
"Hawar".....	4
Bî Çaveki Mitolojik, Folklorik û Politik Naveroka Newrozê.....	10
Zembilfiroş.....	16
Du Gili Lî Ser Peyvên Sinonim.....	18
Rûpelek Ji Dirokê: Mesture.....	20
Newroz.....	22
Niviskareki Nemir Şolohov.....	23
Apê Selim Serê Xwe Dani.....	25
Zordestiya Lî Ser Kurdan.....	27
Çûçik û Istiri.....	28
Civina Niviskaran.....	29
Jî Nav Weşanan.....	30

Ev sûretê rûpelê pêşin ji aliyê  
wênekarê ûris T.N. Yablonska da  
hatiye çekirin.  
Navê sûretê "Pirejineke Kurd"e.

SAL : 6  
HEJMAR: 48

XWEDİ : Komela Karkerên Kurdistan  
Li Swêd  
BERPIRSIYAR : Rohat  
NAVNIŞAN : Karlbergsv. 32B. nb  
113 27 Stockholm  
TELEFON : 08-328251  
HESAP NO : PG. 458980-0

UTGIVARE : Svensk-Kurdiska  
Arbetar Föreningen  
ANSVARIG UTGIVARE : Rohat  
ADRESS : Karlbergsv. 32B nb  
113 27 Stockholm  
PG : 458980-0

## Jİ XWENDE VANAN

### ELMANYA

Hevalên hêja, kovara we ya gîranbi ha û nîrx, hejmara sêwemin kete des-tê me. Dî her hejmarekê da, lî ser zîman, tore û çanda gelê me, em roni dîbin. Bi baweriya mîn, Roja Nû ge-lek tiştên hêja û wundakiri dîkoline, derdixe ser rûyê erdê û radixe ber bala xwendevanan. Jî ber vê yekê, Ro-ja Nû dî warê çand, tore û hunera ge lê me da bûye baxek jî baxê nêrgiz û kulilkên Kurdistanê. Disa dî vi wari da, bûye dareke nemird reh berdaye bin çiya, detîl, rez û deştên Kurdis-tanê.

Ew, dî her hejmareke nû da huner-mend, zane hozan û ronakbirêne me, bi me dîde naskırın. Ew dî nav rûpelên xwe da hertim cih dîde zaneyêne mezîn wek Ahmedê Xanê, Şerefxan, Celaled, Kamuran, Cigerxwin, Qanadê Kurdo, He-ciyê Cindi û gelekên mayin. Ev yeka baweriyeñ me hîn ji xurt dike.

Hevalno,

Jî ber vê yekê, ev kar û barê hûn dî vê rê da pêk tinin zor hêja û de-lale. Jî we ra pêşketinê dîxwazîm û helbesteke xwe ji pêşkêsi Roja Nû dî-kim.

Fexri  
Mannheim-Elmania Federal

### ROMANYA

Berpîrsiyarê "Roja Nû" ra:  
Hevalên hêja,

Ez gelek sîlavêن şoreşvani ji we ra rîdikim.

Ez geleki pê kîfxwêş bûm, dema mîn "Roja Nû" dit. Ez hêvidarim ku hûn, wê herdêm jî bo me bîşinîn.

Hawar  
Romanya

### AWUSTURYA

Jî niviskar û berpîrsiyarê  
kovara "Roja Nû" ra :

Em, du kurdêñ jî Kurdistanâ bakûr in. Em zehf serbilind û serfirazin ku we kovarek wek kovara "Roja Nû", ev-çend bi pîrberi, hunermendi û welat-perweri pêk aniye. Hêviya me, domandin û serfiraziya kovarê ye.

Em dîxwazîn bibin abonemanê kova-re.

Hemûşk pîrtûkên mamoste Cigerxwin (1-7'an), hûn jî me ra rîbikin, emê zehf berxwedar û dîlxwêş bin.

Me hertim jî xebatêñ çandi, wêjeyi û kurdevari agahdar bikin.

Emê, bêgotin dîravê pîrtûkan jî we ra rîbikin, heke jî me ra bêtin şan-dîn û têkevin destê me.

Serfirazi, serketin û dîlxwesiya we daxwaza dîlê me ye.

Bîrayêñ we  
M.M.Ararat û Xurşit

### EREBİSTAN

Jî ber ku hûn, bi hezaran kilomêtir jî Kurdistanâ şîrin dûrîn û disa bi derd û dîjvariyyêñ gelê kurd, yêñ kûr va mijûl dîbin, ez sîpasi we dîkim û serfiraziya we dîxwazîm.

Eger hûn bikaribin jî me ra, pîrtûka ku tevgeren gelê kurd (1925-937) de wexteki kurt da bîşinîn emê pîr dîlxwêş bin.

Ş.A  
Suudi Ereblastan

### FRANSA

Hevalên hêja .

Kovara Roja Nû, dî aliyê çand û edebi-yata kurdi da roleke gîring dilize. Daxwaz û hêviya me pêşdaçûyina wê ye

H.A. PARIS

**DI NAV DİROKA**

**EDEBİYATA KURDİ DA**

**ROLA KOVARA**

# "HAWAR"

KURDOX

NAL 9  
GÜZ 35  
SÜMİHİ  
29 KASNA-PESİN 1941

HAWAR  
KOVABA KURDİ • REVUE KURDE

ANNÉE 9  
NUMERO 35  
NAMEDİ  
29 DECEMBRE 1941

TEŞKİTİYEN VE HEMMƏR

Tefîra Qurâne	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hollîsîn Cenîcî Pîsîmber	Dr. K. A. Bedir-Xan
Dîwana Melî	Qedîrî Çenîl Paşa
Hevîna Perîxamî	Nüredîn Çâfî
Kurdîstanî Takûr	Hîyar
Gromêrî Kurdmancı	C. A. Bedir-Xan
Zérî Evrûspayé	Gemîle Tacîdî
Di Elâmetîkî te	Evdîrehmanî Rojî
Ser	Sîmalîn Serhîdî
Rewşa dînyayê	Nêrewan
Sohînî	Sîtanvan

SAM-1941  
ÇAPXANA SEBATE

Tevi gelê kurd dî gelek heyamên dîjwar û aloz ra derbazbûye û hin ji, dî bin baskêñ stemkariyê û çewsandinê da dinale lê tat û latêñ çiyan, xak û axa Kurdistan yêñ bî xûna qurbanêñ welatparêz hatine avdan, baweriya mîletê kurd bî roja azadiyê her pîrtîrxurt kîrin, dî vîrda gotina Fîrans Fanonê zînci bî bira me tê, gava dî got: "Ew lêdana ku min nekuje, hin min bî hêztîr dike".

Her wîsa ji niştîmanperweren kurd wek singen zêndiyane, şaxen Kurdistan, bî rûmet û şehnazi li hember hemû babelisken hungiri, bahozên bêzari rawestan.

Celadet Bedir Xan yek ji wan dilêran bû, ku bî hemû gîyan û canê xwe dî 15 Gulanê da sala 1932 an li bajare Şamê, dest bî derxistîna kovara "HAWAR" ê kîr.

Ev çend sale jina kovarê kuta bûye, lê gîringiya naveroka wê dî dilêñ xwendevanan da jindare û cihê bilind di rûpelîn diroka kurdi da gîrtiye, rewşenbir û hozanêñ kurd wek Prof. Q.Kurdo ji zûda bir û baweriya xwe li ser "HAWAR" ê nivisiye: "Eger Celadet û Kamîran Bedir Xan kovarêñ xwe bî dernexistana, gelê Kurd wê nîzani-ba ku dî nav wi da hozan û helbestvanêñ navdar wek Cegerxwin kêm ninin". Lî cara yekemin ku H. Hebeş lêkolinek kûr û wîrd (hûr) li "Hawar" ê kîr û navê "HAWAR Û ROLA WÊ DI PÊŞDAÇÛNA ÇANDA KURDİ DA" dî hundîrê 151 rûpelan da bî zîmanê rûsi û bî serwêriya zanîsti Q.Kurdo nama doktoriyê bî serkewtineke gewre li paytextê Sovyetê kutakîr. Di pêşgotinê da H. Hebeş dînivise: "Du sedemîn bîngehin hene, ku min "Hawar" ji bo nama doktoriyê hilbijart, yekemin, pîrsen pêşdaçûna çanda kurdi dî "Hawar" ê da heta roja iro gîringiya xwe wîndanekiriye.

Duwemin, dî hundîrê "Hawar" ê da gelek gotarêñ dewlemend, cure cure û hawaskar ji bo lêgerinê hene.

H. Hebeş beri têkeve naveroka "Hawar" ê jina Celadet Bedir Xan bî xwendevanan dide nasin û dînivise, Celadet ji malbateke şoreşger û niştîmanperwer bû, kurê mir Emin Eli Bedir Xan bû, dî meha 26 Nisanê, sala 1897 an da hatiye dînê, bîrayen wi Suriye û Kamîran bûn, Rewşen malxuya C.Bedir Xan bû, herdu xudê kurek û du keçan bûn.

Bedir Xan dî dema xwe da ji bo rîzgariya Kurdistan dî bin des-têñ sultanêñ Tîrkiyê tekoşin da. Dî sala 1842-1848 an da Emir Bedir Xan bi raperinek mezîn li dîji sultanêñ Tîrkan rabû û beşek gewre ji Kurdistanê rîzgarkîr. Celadet ji li ser rîç û şopa bav-kalêñ xwe berdewamkîr, pişti şerê cihanê yekan Celadet dî xebata ramani kurda da bî çalaki hevparbû, ew û bîrayen xwe va dî damez-randîna rîkxîrawen rîzani da ji hevkar bûn.

Di sala 1919 an da Celadet û birayê wi Kamiran, di amadekirina raperinê li çiyayên Kaxtê û Melatiyê da besdar bûn, di sala 1922 an da Celadet û Kamiran dîçin Munşinê (Elmanya) bavê wan û bî lawê mezin va dîçin Mîsirê, herdu bîra li Elmanya di fekulteta dademendiyê da dixûnîn û hin bî serda ji Celadet bî wêjeya (edebi yata) cihani, lêkolin û lêgerina ser diroka gelê kurd xerik (mîjûl) dîbû. Di sala 1925 an da herdu bîra vedigerin Kurdistanê û di şoresa Şêx Seid da hevkardibîn, piştî gelek rêkxîrawêñ rêzani di hundirê yek rêkxîraw da bî navê "Xûyibûn" dîbin yek, Celadet dîbe serokê "Xûyibûne".

"Xûyibûn" raperinek bî seroketiya general İhsan Nuri Paşa li çî yayêñ "Ararat" rakîr, piştî vê raperinê pîr kes direvin Iranê û Celadet ji bî wan ra dîçe, lê hukumeta Iranê ew qebûl nekîr, Celadet bî xwe di sala 1930 da nîvisiye "Hukumeta Iranê rîdan neda min ku ez li vir bîminim, ji ber ku min xwesteka wê bî pêkneani, ji ber wê ji, ez şandim Iraqê, lê ez û pîr hevalen "Xûyibûnê" va çûn Suriyê". Li Şamê Celadet, Rewşen û bî zarêñ xwe va cih dîgrin û li vir dîjin.

Celadet ji sala 1934-36 an da dîbe wanedare zîmanê firansi li dîbistanan da, di sala 1939 da dîbe advokat wi gelek zîmanê bîyani dîzanîn wek, erebi, tîrki, yonani, alemani, firansi, engîlîzi, rusi. Ji gîringtîrin û baştîrin karêñ wi derxistîna "Hawar" ê û pêkanina elêfbaya kurdi bî tipêñ latini bûn, Celadet ji xwe ra rîya lêkolin, lêgerina dirok û çanda kurdi hilbijart û digot, xe-bata rêzani hewce bî zîmîn, dirok û çanda kurdi destpêbîke, pêwîste pîrtûk, rojname, kovar bî zîmanê kurdi bîn belavkîrin. Celadet di 15 têrmehê sala 1951 an da xatîrê xwe ji ronahiyê û gelê xwe dîxwaze û bî vege li tariyê dîbe mîvan, lê berhem û samanê wi di dîlêñ kurdperweran da her jîndarin.

Afrankarê pîrtûka teze di birê yekan da bî kurtahi li ser diroka kovar û rojnamen kurdi di navbera van salan da 1898-1943 dînivise, di vir da dîbêje, li ser diroka rojname û kovaran heta nîha hîndîk hatiye nîvisandin, A.Sucadi di pîrtûka xwe da "diroka wêjya kurdi" navêñ (78) rojnaman û kovaran dînivise ji rojnama "Kurdistan" da 1898 heta kovara "Roja Kurd" 1971'an.

Cemal Xeznedar di pîrtûka xwe da "Li ser rojname û kovaren kurdi" ya bî zîmanê kurdi, erebi, engîlîzi li Bexdadê hatiye çapkırîn, bî kurtebiri li ser rojname û kovaren kurdi ji destpêka "Kurdistan" da 1898-1973 an nîvisiye.

Di sala 1975 an da li Bexdadê pîrtûka Cebar Cebari bî navê "Diroka rojnamevantiya kurdi" hat weşandin.

Di sala 1978 an da li Bexdadê pîrtûkeke zanisti li ser diroka rojnamevantiyê ji aliyê D.Kemal Mezher hat nîvisandin. H.Hebeş li ser va pîrtûkê dîbêje, D.K.Mezher bî temami û kûrani naveroka rojnaman di warêñ rêzani û wêjeyi da ronahi kiriye, ev kara cihê xwe li nik lêgervanan gelek bî nîrx û qimete....

Li gor cihderan ji sala 1898-1943 an 14 rojname û 9 kovar ronahi ditîne, "Kurdistan" 1898-1902. "Kurd" 1907. "Têgiştini Rasti" 1918. "Kurdistan" 1917-1918. "Pêşkewtin" 1919-1922. "Roja Kurd, Şeva Ecem" 1921. "Bangi Kurdistan" 1922-1929. "Roja Kurdistan" 1922-1923. "Bangi Xak" 1923. "Umida İstiklal" 1923-1924. "Jiyana Nû" 1926-1928. "Ziman" 1938-1939. "Jivan" 1939-1950. Navê van kovaran ji wek jêr hatîne nîvisandin.

"Roja Kurd" 1913. "Bangi Kurd" 1913. "Diyari Kurdistan" 1925-1926. "Zari Kurmanci" 1926-1932. "Ronahi" 1936. "Hawar" 1932-1943

"Gelewiş" 1939-1949.

H.Hebeş dînîvise "Hawar" şûneke taybeti dî diroka rojnametiya kurdi da gîrtiye û roleke mezîn dî pêşdaçûna çanda kurdi da listi ye.

#### REWSA DİROKİ Ü DERKETINA HAWAR

Raperina Şex Seid lî Kurdistana Tîrkiyê dî sala 1925 an da hat rûxandin (şikandin), lê gel baweriya xwe jî bo azadiya Kurdistan wînda nekir, hêzên niştimanperwer dî bîn durûşma "Serbestiya mafê çarênuşî" dî meha Tebaxê, sala 1927 an da dî hundirê rêkxiraweki netewi da bûn yek, navê wa rêkxirawe bûye "Xûyibûn" kongîra yekê lî çiyan hat gîrêdan, yek jî gîringtîrin bîryarêng kongîrê, xebat jî bo serxwabûna Kurdistanê bû. "Xûyibûnê" raperinek nûh amedekir û dî 28 tebaxê, sala 1927 an da serxwebûna Kurdistanê lî gor peymâna Saykis-Piko" daxûyankır, navbenda hukumeta kurdan navçeya "A raratê" bû lî wîr ji ala kurdi çîkandin, lê belê kêmasiyek vê rêxistinê hebû, ew ji tûnebûna bernameke rêzani û eşkere bû û hêzê kurdan lî gor ya dîjmin jar bû. Dî 11 hîzeranê sala 1930 da leşgerên Tîrkan hêriş ajotin ser çiyayê Ararat û şer dî navberê kurdan û tîrkanda ta 13 Tîrmehê berdewamkîr, pişti diyar bû ko ev raperin bi sernakeve, gelek pêşengê "Xûyibûn" çûn navçeyen Kurdistan Suriyê, jî ber ko hukumeta Suriyê dî wa demeda lî gor hukume tênen İranê û Tîrkiyê pêwendîya xwe bi kurdan ra baştîr bû, Sûriyê wa hingê dî bîn destêne Firansayayê da bû. Dr.E.R.Qasimlo dînîvise Firansa dixwast tevgera netewa kurda jî bo sûda xwe bi karbine, bi taybeti pişti raperina 1925 an lî Kurdistana Tîrkiyê, Firansa bala xwe baş daye rêkxirawen rêzani û cîvaki yên kurdan û bi hewase ke mezîn bala xwe da "Xûyibûnê" jî ber ko pêwendiyen Firansa bi Tîrkiyê ra ne baş û jar bû, lê pêwiste bê gotin, gava ko pîrs lî ser Kurdistanê dîhat, herdu hukumetan (Firansa û Tîrkiyê) xwe digi handin hev û bi çalaki rêzaniyê xwe lî dîji kurdan bi cihdianin.

Dî 20 çîriya pêşin sala 1921 an da beşek bi çûk başor - roavayê Kurdistanê (navçeyen El-Cezire- û El Cebel- El Ekrad (Kurdax) ket bîn destê Suriya Firansi, jî bo nîmûne bûyerek diroki jî mera mîlag dîke ko çawa herdû hukumet lî dîji gelê kurd bûne yekdest, gava raperina Şex Seid rabû, hukumeta Tîrkan wê nikarîba şoresh bis-kanda, eger hukumeta Firansa rêk nedaba leşgerên Tîrkan ko dî beşê Kurdistan Suriyê ra (dî rêka çimana Bexdadê ra) hêrişâ xwe bajota ser kurdan. Pişti vê hêrişê kurd neçarbûn herin navçeyen çiyan, wa hingê leşgerên Turkan bajarêng kurdan zevtkîrin û xîstîn bindesten xwe. "Xûyibûn" kete rewsek dîjwar, çend mehan em lî Helebê man, wîsa dibêje, Dr.Nureddin Zaza, hukumeta Tîrkan jî hukumeta Firansayê xwest, kurdêng ko jî Kurdistana Tîrkiyê reviyan û çûn Suriyê, wan disan vegeerinîn Tîrkiyê, Firansa soz da hukumeta Tîrkan lê soza xwe bi cihneani, lê pîraniya kurden reviyan, şandîn Şamê ta ko jî sinorê bi dûrkevin, dî rewseka wîsa da "Hawar" lî Şamê hate jine.

#### ARMANC Ü ERKEN HAWAR

Armanc û erkîn "Hawar" ê dî hejmara yekanda hatiya daxûyankırın ev xalê jêrin bi kurtahine: 1-Belavkirîna tipêng zimanê kurdi dî nav kurdan da. 2- Xwendîna diroka pêşketîna zimanê kurdi, hevnêzik bûna zaravêng kurdi û xwendîna pêwendiyen wan bi zimanêng niziki zimanê kurdira. 3- Cîvandîna cûreyen zargotîna kurdan, çirok, stran-ê qehremantiyê, şahiyan, oli, metelok, u.h.d. 4- Xwendîna afran

dînêñ kevneşopêñ (kîlasikêñ) kurdan, helbestvan û nîviskarêñ nû-jenbar û navdar û wîsaji xwendîna karêñ gîring yên dirokvanan. 5- Xwendîna (sema (reqs) û musîqa kurdan. 6- Xwendîna itnografiya (Ülim lî ser cihdera gelan) jîna kurdan wek adetêñ oli. 7- Xwendîna dirok û erdnigariya Kurdistanê.

#### CELALET BEDIRXAN Û XEBATÊN KI

C.Bedir Xan ji hemû aliyan da rewşenbir bû, wi çirok, helbest, gotarêñ diroki dînîvisandin û ji zîmanê bîyani ji werdîgîrandin zîmanê kurdi, folklora kurdan dicivand. C.Bedir Xan bî gelek na-van di "Hawar" ê da gotar û nîvisarêñ xwe çapkirin wek Hîrql Ezi-zan, Bavê Cemşid, Xûdê Hawarê, Stranvan, Seydayê Gerok u.h.d. Na-veroka helbestêñ C.Bedir Xan cure-cure ne, bî pîrani lî ser welêt û zarokan hatine nîvisandin, dî helbestê xweda "Şev bîminê xweş" dibêje, zaro lî hivê û sîtérkan sêrdikin, şadibin, lê kesêñ mezîn (navsere) bêzari rojêñ pîsporêñ xwe bî bira xwe tinin, dî helbestêñ din da ji C.Bedir Xan gazi dê û bavêñ zarokan dîke ko ew za-rêñ xwe bî guyana welatpareziyê perwerde bîkîn ji ber ko berpîrsi yariyek gewre lî ser mîlêñ neweya nûhatî heye, xwe amedebîkîn ji bo qurbana niştiman ra û hin helbestêñ din ji navdar hene wek "Azadi", "Bilûra min" em keriyek bî çûk ji helbesta "Bilûra min" bî xwendevanan didin nasin.

".....  
Bilûra min, binêre û bibise !  
Roj çû ava,  
Stêra êvarê bû ges  
Û pelen ava şevêñ reş  
Ketîne deş û newalan  
Bilûra min !  
Dengê xwe berde !  
Dînya mina zarokeki bersir  
Ket dergûşa xewê  
Dengê xwe berde bilûra min  
Û jêra bilûrine  
Xema wê birevine !

C.Bedir Xan afrandinêñ helbestvanêñ Fîransi ji yên gernas wek Lamartina A.De Vîni, û Bodlera û B.Higo wergerandin zîmanê kurdi. Û ji helbestêñ Hafize Şirazi bî zîmanê farisi wergerandin zîmanê zîkmaki. Xudi "Hawar" ê wêjeya kurdi ya kevneşopi (kilasiki) ji dizani û bî xwendevanê xwe dîda nasin û lî ser afrandinêñ helbestvanê zor mezîn Ehmedê Xani gotar nîvisiye û têda dibêje: "E. Xani guyana zîman vekîr, welatparezi dî wêjeya meda ji E.Xani da dest pêdike".

Bavê Cemşid (C.Bedir Xan) gotarêñ diroki lî ser kurd û Kurdistan lî gor nêrinêñ bîyaniyan da didan çapê û her wîsaji lî ser kurd û Kurdistanê dî heyama Yonanistanê da gotar diweşandin.

C.Bedir Xan hin keri ji pîrtûka merşale aleman N.Multke "Têbini yên lî ser rohilatê" wergerandin û dî hawarê da weşandin.

Gava şerê cihanê duemin bîhevket, leşgerên Yekitiya Sovyet û Engêlizan lî İranê bûn û herduali ji lî dîji Hitler bûn, Celadet Bedir Xan gazi kurdan dîke û dînîvise hewce kurd pîstgiriya Rûsan û Engîlizan bîkîn, ewana wê kanîbin alikariya Kurdistanê ji bo cihanina mafê netewi bîkîn. "Xudê "Hawar" ê nîrxek gelek biha dîda xortêñ kurdan û gotar lî ser wan dînîvisandin û dî nîvisarekê da dibêje "Xortêñ ciwan bîbîn berpîrsiyarê enînîvisiya xwe, ji bo

mêran ev berpirsiyariya ducarkiye, bî mérani bî rêkên çiyan da he  
rin..... xwe bîgrin.." û ciheki dînda dîbêje "Her xortek pêwistê  
jî bo gelê xwe bixebite, zanebûna xwe dewlemend bike..." C. Bedir  
Xan lî ser rojname, kovar û bernama radyoya kurdi gotarêñ xwe çap-  
kîrine. Dî hejmara 26-54'an da rêzimana kurdi (kurmanci) jî aliyê  
xudê "Hawar" ê da hatiye nîvisandin.

#### HAWAR Ü PIRSA ÇANDI

Dî "Hawar" ê da gelek mîrovêñ gernas gotarêñ çandi, diroki lî  
ser gelê kurd çapkîrin, wek Osman Sebri, Kamiran Bedir Xan û h.w.

Dema ku "Hawar" derdiket, cihderêñ kurdi lî ser gelê kurd kêm-  
bûn, jî ber wê "Hawar" ê lêgerinêñ dirokvanêñ kurd û bêganan pîr  
çaran bî pêkdianin û yet jî cihderêñ gîring ev bû, "Siyhetname" ya  
ko Ewliya Çelebi nîvisibû. Ev pîrtûk bî zîmanê Tîrki hatîbû nîvi-  
sandin, pişti pîrtûkê ciheki fereh di nav mîletê kurd û pêsesazi-  
yan da gîrt, pîrtûk bî zîmanê kurdi hat wergerandin. K.Bedir Xan  
bawerdanek lî ser vê pîrtûkê nîvisand, lê kuta nekîr, Q.Kurdo ba-  
werdan lî ser wê kutakir û dî rojname "Dengê Komkar" da, da weşan-  
din. Osman Sebri gelek gotar lî ser kok, dirok, wêje û çanda kur-  
dan nîvisiye, cihderêñ gotarêñ wi jî afrandinêñ dirokvanêñ kurd û  
navdar Muhemet Emin Zeki bû. Û dî "Hawar" ê da gotar lî ser mîro-  
vê kurd yê ku roleke mezîn di diroka cîvaka mîrovayeti da listiye  
hatiye weşandin, wek Selhatin Eyûbi, C.Bedir Xan gotarêñ xwe jî  
pîrtûka Şêx Ebdil-Rehman-Garisi dîbir û dî "Hawar" ê da, dîda we-  
şandin, jî ber ko Garisi gelek baş lî ser dirok û koka kurd dîza-  
ni û hin di gotarêñ xweda karêñ qonsilê rus Caba lî Erzerumê bî  
kardiani.

Dî "Hawar" ê lî ser helbestvanêñ kevneşopi wek Heriri, Mileyê Ce-  
ziri, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xani dîhat nîvisandin û helbestêñ wan  
jî dîhatin weşandin.

#### PÊWENDIYÊN HAWARÊ BI ORGANÊN MAYIN VA

Belavbûna rojname û kovarêñ kurdi di navbera rêdeksiyon û xwen-  
devanêñ wanda herdem dîjwar bûye, ew ji bî hoyêñ rêzani va hatî-  
bûn gîredan, lê rêdeksiyona "Hawar" ê bî awayêñ hismendi kanibû  
hevgorêdana xwe bî rêdeksiyonêñ rojnaman û kovarêñ kurdi ra lî  
hemû besêñ Kurdistan û bî rojname "Riya Teze" ra lî Sovyetistanê  
çêkira.

C.Bedir Xan bî xwe lî ser pêwendiyêñ "Hawar" ê û "Gelewêjê" di-  
nivise û lî ser çar hejmaran jî "Gelewêjê" bawerdana xwe dî "Ha-  
war" ê da dîda weşandin. Kovara "Hawar" ê hîn dîgişt Lîbinanê,  
Mîsirê û Urdinê.

#### HAWAR Ü SERÊ CIHANEYI DUWEMIN

Dî destpêka şerê cihanê duwemin da "Hawar" ê nûçeh lî ser rewşa  
cihanê belavdikir û bî taybeti kovarê lî ser qehremantiya gelê  
Sovyet dî şer da dîda xûyakîrin û hin ji lî ser şar û komarêñ  
Sovyetistanê jî gotar dîweşandin, gava faşistan hêriş ajotin ser  
Mosko, "Hawar" ê nîvisand, Yekitiya Sovyet wê bî serkeve û dîbêje  
çawa Moskoan zora Napolyon birin, wîsa ji Yekitiya Sovyet wê zo-  
ra faşistên Elman bîbe. Q.Kurdo nîvisiye, Kovara "Hawar" ê zor lî  
dîji faşist û naziyêñ Hitleri bû û lî aliyê Yekitiya Sovyet dise-  
kini.

## HAWAR Ü PIRSEN OLPERESTI

Pêwendiya "Hawar" ê bî ola islam ra baş bû, mezineki Yezidiyan Şêx Heyderi dî "Hawar" ê da nîvisiye "Bîrano! Bîla hemû zanîbin, pêwiste ol me ji hevdû cuda neke, cudabûn dî nav meda tûneye, bîla dî nav meda musliman, yezidi, xaçeperest hebin, lê beri her tiştî em kurdin.

H.Hebeş gelek pîrsên dîn ji gîring dî pîrtûka xwa da lî ser "Hawar" ê anîne meydanê û bî hûrgili ronahikirine, em bêjîn wek "Weşanê wêjeyi", "Hawar" û folklorâ kurdi", "zîman û stil (şêweya hevgirêdana gotinê kovarê) û her weha pîrsên dîn.

Lî dawi pêwiste bê gotin, H.Hebeş bî afrandîna xwe gelek perjewend û sûd lî gelê xwe setembar kîr û nemaze samaneke dewlemend lî ser diroka rojnamevantiyê zêde kîr, ev kara tengheheke zor bîlind û bî nerx dî rûpelên çanda Kurdistanê da digre.

Ev pîrtûka pîr zanebûnê dîde xwendevanêñ xwe û bî camêrbûn xwen devanan bî hemû aliyêñ jina kovara "Hawar" ê dîde nasin, mîrov dîkare vi kari ji bo karêñ zanîsti cihdereke mezîn û zebend bêjmêre, em bî hêviyeke gewrene ku mîletê me vê pîrtûkê bî zîmanê zîkmaki ji bixûne. Jî ber vê berhemâ gîranbiha, em xudanê wê, welatparêzê dîlsoz H.Hebeş ji dîl da spas bikin û serkewtinêñ hêja ji karêñ wi pêşende ra hêvi bikin.

## ferhengok

Xwendevanêñ hêja, me pêwist dit weki em ji vîr şûnda, dî her hejmarê da cih bîdine listeke peyvîn ku dî wê hejmarê da, bî pîrani he ne û dî zîmanê axiftinê da zêde rûnenistiñe.

abor	ekonomi
abori	ekonomik
amade	hazır
asteng	engel
babet	konu
bûyer	olay
cuda	ayrı, farklı
cudati	farklılık
cure	çeşit
çand	kültür
çandi	kültürel
daxuyani	miting, gösteri, sergi
dijwar	zor, zahmetli
dirok	tarih
ferheng	sözlük
ferhengok	küçük sözlük
gili	söz, bahis, şikayet
gotar	söylev, makale
helbest	şîir
helbestvan	şair

hevpeyvin	söyleşi
hevrik	zıt, karşıt
navgin	araç
naverok	îçerik
nûçe	haber
nûçegihan	muhabir
nûjen	yeni, modern
perwerdegari	eğitim
peyv	sözcük, kelime
pêwist	gerekli
rexne	eleştiri
rexnevan	eleştirmen
rêzman	gîramer
sazûman	düzen, sistem
sedem	neden, sebeb
sereke	başlıca
serok	başkan
şîrovekîrin	açıklamak, yorumlamak
wergerandin	çevirmek, tercüme etm.
werger	tercüman, çevirmen
weşan	yayın
weşandîn	yayınlamak
weşani	yayın, yayınsal
wêne	resim
wênevan	ressam
wênekêş	fotografçı
vekolandin	araştırmak
vekolîn	araştırma
zarav	lehçe
zargotin	sözlü edebiyat

# NAVEROKA NEWROZÊ

## Bî Çaveki Mitolojik Folklorik Û Politik

ROHAT

Newroz Rojeke Nûye

Newroz, dî nav gelê me da bûye nişana daxwaza berxwedanê. Peyva Newrozê ji du gotina pêkhatiye, nû û roj. Dî nav gelek salan da nûroj, nûroz û newroz, bî vi tehri hatiye guhîrandin. Cejna Newrozê cara pêsin dî nav kurdan da hatiye pirozkırın, paşê ev cejna dî nav gelên afgan, belucin, farisi, tacik, oset, tat û talış hat naskırın, dî nav van gelên cinar da, cejna Newrozê angori bî navverok û motivên netewi va hat xemîlandin, dewlemend bû. Jî ber nêzibûna kontakên çand û ziman dî nav gelên İranê da, ji aliyê din sal bî sal dî navbera van gelan da peywendi û pevgirêdanêñ cuda hatin pêkanin. Hemû van yekana, lî vê hêlê belavbûna cejna Newrozê hêsatır kîr.

Dî nav kurdan da rojên şabûnê wek cejn, eyd, mehrican û şahi têñ zanin. Dî nav van rojên nav û nişan da bê şık, cejna here kevn cejna Newrozêye. Ev cejna beri bûyina İsa pêxember, dî dewra dewletên Kusi û Med da peyda bûye (sala 612) û serpêhatike wê dûr û dîrêj heye. Bî vi tehri mirov dikare bêje, ev cejna iro dîkeve 2596 saliya xwe. Çawa dî serpêhatiya Newrozê, dî mitologiya wê da kîvş dîbe, weki dî salêñ agîr û hesin hat ditinê, ev cejna wusân ji dema dî nav mirovan da peywendiyêñ koletiyê xurt bûn, peyda bûye.

Pirozkırına cejna Newrozê, navbera hatîna rojên baharê, rojên germ û dûrketîna rojên zivîstanê, rojên sar da tê pirozkırın. Jî a liyê din Newroz wusan ji dî nav gel da tê zanin wek "Cejna Serê Salê". Dî van rojan da, çawa tê zanin jîyin gul vedide, dîkele. Bî ditîna me, ev cejna berxwedanê, pirozkırına wê dî nav van rojan da bî tesadufi nine, navdanina wê ya cejna serêsalê ji tesadufi nine. Hilbijartîna van rojan, efrandariya gel nişani me dîde. Meha (Axlêve, Avdar, Newroz), dî vê mehê da jîyin qalikê xwe diguhîrine, dorber hêşin dîbin, hebûnêñ tebiyetê jindar û hîşyar dîbin. Dî vê mehê da hulmgulma kela baharê dî nav gel da şabûnekê peyda dîke. Ev şabûna dîghêje dereceke here bîlind. Jî ber vê yekê, gel ev meha, despêka serê salê hilbijartiye û lêxwedi derketiye, xîstiye malê xwe. Gelê me xwestiye, pivaye, her tîst daye ber çavê xwe, hildaye-daniye û tîstêñ baştır hîlcandiye. Bî xwe ev karê gel, dî nav efrandinêñ folklorê da gelek berbîcave, gel tîmê aliyê tîstê baş girtiye, ev xeysetê efrandariya gele.

Bî xwe dî nav peyva mitologiyê da du tîstêñ gîring hene, armanc û çarçevek heye. Ev peyva ji du peyvan pêkhatiye; "mit" û "logos" Mitologi bî serê xwe tenê çirok, mit û efsane nine, xem û xeyal nine. Jî aliyê din dî nav vê peyvê da kerik mantik (zanebûn, logos) ji heye. Jî ber vê yekê peywendiyêñ felsefi dî nav mitologiya Newrozê da pîr xurtin.

## Dı Nav Klasikan Da

Heta niha lı ser naveroka cejna Newrozê bı çaveki mitologi, folklorik û politik pır tıst hatine nivisandin. Bi taybeti dı nav hın efrandinê klasik da pır tıstên hêja hene. Hêdi-hêdi gelê me lı ser cejna Newrozê zanebûna xwe hın fireh kır û naveroka wê dewle-mend kır.

Pırtûka olperestiyê Zend-Avesta çawa tê zanin, dı nav gelên İranê, wusan ji dı nav kurdan da, pırtûkeke pır kevne. Dı nav vê pır tûkê da lı ser cejneke baharê hın tıstan cih girtine, bi ditina me ev cejna Newrozêye. Ji ber ku êzidîyên ku iro di şopa vê pırtûkê da dîmeşin, dı nav wan da cejneke wek Newrozê bı navê "Cemayı" hın ji hebûna xwe iro díparêze.

Cejna Newrozê bı tehreki fireh cara pêşin di nav efrandîna Firdefsi, "Şehname" da cih girtiye. Gelê kurd, çawa derketiye maderê ev pırsa ji cara pêşin di vê efrandinê da hatiye nitirandin. Ev efrandinâ hêja paşı bûyina Isa, dı sala 999'an da hatiye nivisandin, efrandin gelek firehe. Dı despêkê da lı ser mitologiya Newrozê hatiye seknandin, Firdefsi yek-yek mîrxasân serpêhatiya Newrozê bı me dide naskırın.

Efrandîneke mayin ji, "Newroznama" Omer Hayame, dı vê efrandinê da ji nexş-nigarêñ cuda lı ser vê cejna gelên İranê heye.

Çawa tê zanin dı sala 1597'an da mirê kurdan Şerefxanê Bitlisi, bı navê "Şerefname" efrandîneke hêja lı ser diroka kurd û osmanîyan nivisi, dı despêka vê efrandinê da lı ser Newrozê û hovitiya zalimê Dehak hatiye seknandin.

Pispor û helbestvanê kurd Ahmedê Xanê dı destana "Mem û Zin" da kurd çawa Newrozê piroz dîkin, bı hatîna baharê va mîrov çawa ji qalikê xwe derdikevin, çawa şâ dibin, bı zimaneki xweş û zelal va nivisiye. Ev efrandîna dı sala 1665'an da hatiye nivisandin, keri-ki wê da Newroz, bı vi tehri hatiye nitirandin:

Jı Bextê şin vedigere bahar

Nisan dîde Newrozê

Dı rêça vê kevneşopiyê da

Bajarvan û gundi hemû bı hevra

Terikandin birc û malen xwe

Wek nêçirvan û cerdê

Hêdi-hêdi berbi serê kelan û beriyan meşîyan

Bı beş-beş derketin bindarûk û seyranê

Hemû rengê mirovan, piçûk-mezin

Hemû çûn, nema tu evdê xwedê lı bajaran

Jı wana hînek bı peya çûne bax û baxçan

Hînek bı siyari berbi qontirên çiya herîkin

Hînek bı zar û zêçan va

Hînek bı hevalan, hînek ji bı tenê meşîyan

Rabûn zerî-doman û jîn ji

Ew ji wek gulan, dı nav baxçan

.....

.....

(Ev helbestê Ahmedê Xanê angori Kurdiya iro hatiye zelalkırın)

Xên ji van efrandinê lı jor nivisandi, dı gelek efrandinê far si û kurdi da ji tıstên hêja lı ser cejna Newrozê hene.

## BI ÇAVEKİ MİTOLOJİK

îro lı ser mitolojiya Newrozê lı hin hêlên cûda, gelek serpêhatiyên cihê têñ dengkîrin. Jî bo pêstabırına folklora xwe, gel jî ber xwe gelek tîst efrandiye û tevi naveroka Newrozê kiriye, ew dewlemend û rengin kiriye.

Gelên vê navçê dixwazin jî destê zordestê Dehak (*Ejderhak, Zahak*) xelas bin, azad bin, serpêhatiya Newrozê dice dîghêje van rojan. Bi zimanê pehlevi navê Dehak "Biyarbs" derbaz dibe. Hin çavkani dibêjin ku Dehak bî xwe Erebe. Bi baweriya me tîstê gîring, ewe ku Dehak keseki xûnxware, zalime. Gel dixwaze pêsira xwe jî vi kesi xelas bîke, bona vê ji gel hertim lî dîji wi ye. Bi vi tehri gel naxwaze stûyê xwe ber zordestiyê xar bike, gel şer dîke, pêşen, giyê Kaweyê mîrxas dîmeşine, gel û Kaweyê mîrxas dibin efrandarêñ Newrozê.

Angori mitologiyê rojekê jî rojan dî nav gel da nereheti û bê-hizûrike mezîn peyda dibe. Dî wê demê da, Dehak lêdixe bedena mi-rê wê dewrê, Cîmşit dîke du kerîyan, wi dikuje, xwe jî lî ser text rûdînê, disa angori mitologiyê textê wi lî dora 1000 sali ajotkiye. Dehak bavê xwe jî dikuje, dî Şehnamê da ev yekê bî vi tehri hatîye nitirandin. "Laweki nebaş weki bîbe şereki hov ji, disa nikare mîraniyê bîke bavê xwe bîkuje xûna wi birêjine".

Êrişî û hovitiya Dehak dema, dî her namîlên wi da serê du marêñ reş derdikeve, destpêdike. Ev nexwaşıya xeder, wi hin ji har û din dîke. Jî bo ditina dermaneki jî bo vê nexwaşıya xwe, ew bangi hemû hakîm û doxtorêñ welêt dîke û alikariyê jî wan dixwaze. Rojekê angori mitologiyê şeytanek nêziki wi dibe, dizikava guhê wi da dibêje: "Tu tenê mîjûyêñ kesen cuwan bide van maran, tîsteki dîn mede wan jî bo xarinê. Dibe, ev marana van mîjuyan bîxwin û dawiyê da ji bîmrin, tu ji xelas bîbi. Jî ber vê yekê pêwiste tu herroj du kesen ciwan bîkuji, jî bo mîjuyan derxi, pêwiste tu seren wan jê bîki". Ew peyvîn şiretên şeytin, destûrê dîde parêzkarêñ xwe, weki herroj du kesan bîkujin û mîjûyêñ wan bîdin maran. Bi vi tehri herroj du kesen ciwan têñ kuştin. Ev kuştina kesen ciwan hêrs û rîka gel lî dîji Dehak bîlind dîke. Dilê herkesi bî kuştina van kesan dişewite, dî nav van da du xulamêñ Dehak ji hene. Yek jî vana Ermayil keseki dindare, Kermayil ji keseki pêşverûye, pêşîya xwe dibine. Ev herdu xulamêñ wi tinin herroj mîjuyê mikê tevi mîjuyê dîn dîkin, dîdine Dehak. Bi vi tehri her meh 30 kes azad dibe, ew direvin dîçine serê çiyan û hejmara wan dîghêje 200 kesi. Bi vi tehri, angori Şehnameyê ew kesen ku direvin lî serê çiyan û azad dibin, kakîlê peydabûyna gelê kurd pêkanine.

Ev tîstên lî jor goti, tenê beşike serpêhatiya mitologiya Newrozêye. Newroz paşê despêdike dibe cejnekê. Dî vê beşê da keseki xe-batkar-Kawe jî nav gel derdikeve, pêşengiya gel dîke û vê hêrs, rîka gel ra rîkê dibine. Ev bûyera ji dî nav cejna Newrozê da beşike duwemine.

Dî vê demê da çawa em dibinin, keseki bî navê Feridun, wek mîrxaseki dî riya Kawe da dîmeşe, ew ji, jî nav gel derdikeve. Ew dî nav wê tekoşina lî dîji Dehak bîlind dibe, bî aktifi têda cih dîg re. Angori mitologoyê rojekê diya wi, jê ra dibêje: "Tu zani çi hate serê bavê te Abdin?". Paşê Feridun tê dîghê weki bavê wi jî aliyê Dehak da hatîye kuştin û mîjûyê wi ji daye maran. Hêrsa Feridun bîlind dibe û baweriya tolhîdanê lê peyda dibe.

Pey van hemû zordestiyân, gel berbi kesra Dehak dîmeşe. Nav gel

da dengên "Em wekheviyê dixwazin, dadimendiyê dixwazin" her dîçin bilind dîbin, ew lî pêsiya gel van durişman ducar dîke, KAWE bî xwe ye. Êdi pêşengiya serhildanê dîkeve destê zehmetkêşeki, kar kerekî, KAWE, eve, hêjabûn û xemla Newrozê.

Paşi vê serhildanê Dehak tê kuştin, ji ortê radibe. Gel ji şabû nê êdi nikare hêsrêن çavên xwe bigre, roj, roja serketinêye. Roja pirozkirina Newrozê ji, ev roja serketinêye. Hin çavkaniyêن lî ser mitologiya Newrozê, ji bo rolêن Feridun û Kawe tiştine cihê dîn-visin. Hin çavkani dîbêjin ku Feridun destûr derxistiye weki lî Çarsuya hesinkaran da gurzêن baştır bêن çêkîrin. Bî van gurzan va dema gel dajo ser qesra Dehak, hin kesenê dîbêjin pêşajo Feridune, hin kes dîbêjin pêşajo Kawe bûye. Şehnamê da cih dîgre, weki Dehak bî destê Feridun tê kuştin, Feridun tine mixekî lî serê wi da dîkute, wi dîkuje, kesê ku gel berevkiriye, ew rakiriye ser piya û xwe ji daye pêşiyê, Kaweye. Ew, dî nav mîrxasân serpêhatiya Newrozê da cihê pêşin dîgre. Bî xwe ji armanca Feridun û Kawe dî piratikê da yeke, navbera wan xweşe, pişta hev dîgrin.

Ji aliyê dîn, ji despêkê heta dawiyê Feridun dî efrandîna Şehname hertim lî ber şaxsiyeta Kawe temene dîbe. Vê yekê, dî beşike Şehnamê da bî vi tehri cih girtiye :

".... Paşê, ji kelê, alênbî qumasen kesk, sor, zer belav bûn û na-vê wê danin "Ala Kawe" ji vê demê heta, ki rûnişte ser wi texti, ev nav girt. Li ser vi çermê hesinkar, tiştên gîranbiha hatin dardakîrin. Awa, bî van qumasen gîranbiha va ala wi kete tehreki dîn. Dî nav şeveke tari da wek rojekê hilat, dîlê dînyayê bî van hêviyan va tiji bû".

Dema text ji destê Dehak hate girtinê, êdi dawiya kul, derd û zordestiyê hate bîrinê. Êdi pêwist bû cejnek bîhata pirozkirin. Ew rojêن reş êdi dûr ketibûn, paşê pirozkirina Newrozê wek cejnekê bû edet.

## BI ÇAVEKİ FOLKLORİK

Cejnêن gel, lî ser derd, kul, şin û şahiyêن gel bilind dîbin. Van cejnan tenê gel dikare biefrine û wan bîparêze. Ew cejnêن ku bî pîraniya daxwaz, xwestin û hêviyêن gel va bî hev neyêن - cejnêن resmi, dîni- ji aliyê gel da nayên pejîrandin.

Newroz, bî derd-kulan, şabûn û hêsrêن çavan va hatiye avdanê û meya xwe girtiye, ji ber vê yekê vê cejnê dî dîlê gelê me da cihe ki germ girtiye.

Bayisê belavbûna vê cejnê dî nav gel da bî taybeti karkertiya Kawe, zehmetkêşiya wiye, bona vê yekê ev cejna hat gihişte van rojêن iroyin.

Çawa tê zanin, dî wê navçê da dinê islam pîr xurt bû, cejnê dî ni dî van cîvatên vê hêlê da tesireke mezîn hiştine, disa ji van cejnan cihê Newrozê tiji nekîrine, gelê me hertim naveroka wê ya pêşverû parastiye heta van rojan ji ew xweyikiriye.

Ji bo berevkirina gel, Kawe mîzera xwe wek nişanekê ba kiriye, ev mîzera hesinkariyê (Dirrewşê Kawe) gel ev yeka bijartiye wek alekê ji xwe ra, paşê ev ala dî nav rengêن kesk-sor û zer da xemîli, İro ev rengana bûne nişaneke netewi ji bo gel.

Çend çavkani çawa diyar dîkin, weki ev heyfîldana Kawe û Feridun lî dîji Dehak, dî nav kurdan da paşê bûye bawerike mezîn, dî nav kurdan da wek "Şenahiya Tolhildanê" belav bûye.

İro çawa em dîbinin lî ser Newrozê dî edebiyata kurdi da stilek bî kar tê anin, hemû hêzên zordest bî navê Dehak (Dehakên Nû) têن

navkîrin, bîlîndbûna şerê gelê me lî dîji Dehakane, pêşengiyê Kâwe dîke. Ev yeka tîsteki nûye, gelê me tevi naveroka Newrozê kîriye.

Lî Kurdistanê dema rojêن Newrozê nêzik dibin, kûrên agirê (ar, adır) mezîn têñ daninê, gelê me êgir vêdixe. Ditîna êgir dî nav gelêñ ïranê da bûyereke mezine. Bi navê-Huşeng- mîrxaseki gel, rojekê ji bo mareki bikuje kevireki davêjê, ew kevir diçê kevireki dîn dikeve, çîrûsk jê derdikevin, ev bûyera dîbe bayisê nasina êgir dî nav gelêñ vê navçê. İro bîngehêñ pirozkırına cejna "Sede" lî ïranê dîrêji van rojan dîbe. Kawe bi xwe hesinkarek bû, hesin dikuta, ji bo hesin nerm be, kêri tîsteki bê, ev pîr hewcedari êgir bû. Paşê ev agir ji bo pirozkırına Newrozê bu nişanekê. Tê go tîn ku, Kawe ji bo gel berev bîke lî serê kelan agir vêxistiye û bûye nişana hawarê. Disa dî pîrtûka "Zend-Avesta" lî ser hêjabûna êgir gelek tîstan cih girtiye. Dawiya rojêن zivistanê rojêن sar û despêka rojêن germ, rojêن baharê da "Germبûn" bûye mîzgina rojêن xwes, vê yekê rûmeta êgir bîlîndkîriye. Ev yeka dî metelokeke kur di baş cih dîgre "Kê gotiye agir cehenemeye, ew bi xwe cehenemeye". Dî rojêن zivistanê, dî nav kurdan da edeteki kevne, weki lî dor kuçik rûnêñ, bi êgir va bîlizîn. Dî dinê kurda yê kevn "Zerdûş" da agir pîr tîsteki hêjaye ev yeka bi dinê islam va hev nayê, ji ber ku agir dî dinê islam da nişana cehenemeye.

İro ev çîrûskêñ belav dibin, bûne nişana bîlîndbûna şer lî welaletê me, kareki esmaniye (abstrak). Lî Kurdistanê lî her cihê vêxistina êgir, jîndariya daxwaziya azadiya gel baş nişani me dide. Ev çîrûsk, bi vê daxwazê va tev lî hev dibin, dibin yek. Dî efran dînêñ folklorê da ev hevanin-hevçûyin pîr xurte, ev yeka ji tujbûna pivandin û ditinêñ gel nişani me dide.

Bi vi tehri ji bo hebûn û parastina cejna Newrozê gelê me, gelek tîstêñ madi û manevi efrandiye.

### BI ÇAVEKİ POLİTİK

Lî Kurdistanê tekoşina gelê me lî dîji hêzêñ kolonyalist, bi taybeti dî despêka Sedsaliya 20'an da pêl da, pêşta çû. Pey vê yekê van hêzêñ kolonyalist ji bo ortêrakırına hemû hebûnêñ gelê me, ji bo faşkîrin û jarkırına wan, çi ji destê wan hat, anin cih wusan ji, tu wext destûr nedan weki gelê me bi xweşi vê cejna xwe piroz bîke. Cejna Newrozê cara pêşin tenê dî sala 1946'an, lî Komara Mahabatê da bi serbesti hatiye pirozkırın. Paşê lî Kurdistanâ Iraqê, dû şoreşa burjuva-demokrat, dî sala 1958'an hat pirozkırın. Ji ber van hemû dijwariyan, disa ji gelê me, dî nav xwe da, bi xweşi Newroz pirozkîriye û bi giyanê rîzgariya netewi va xemîlandiye.

Bi vi tehri gîringiya pirozkırına cejna Newrozê, dî warê politik da zêde bû, naveroka wê dewlemend bû. Bi taybeti nîviskarêñ nîfşa nûh, dî efrandinêñ xwe da ciheki fireh dane Newrozê. Wan bi çaveki tekoşina rîzgariya netewi va, naveroka wê ya şoreşgeri nîhîrine. Dî efrandinêñ şanoyan da (tiyatro) ev yeka gelek berbiçave. Nîviskarê kurd Cemal Abdulkadir Baban bi helbestvani, efrandîneke bi navê "Newroz" nîvisi. Dî vê efrandinê da serpêhatike keçke kurd Gulizer heye. Ev keçka dikeve destê Dehak û zordestiyan mezîn têne serê wê, naveroka vê şanoyê pêk aniye. Nîviskarê Kurd Kemal Burkay ji, dî "Dawiya Dehak" da lî ser camêriya Kawa û dî bin vê camêriyê da ji tekoşina gelê me dî vê rewşa iroyin da nişan dide. Disa Zeki Ahmet Xanari ji "Xelasbûna Rojêñ Dehakê Zordar" bi vi navi va şanoke dîn nîvisi. Hemû ev efrandinan dî nav

çanda kurdi da tesira cejna Newrozê dî warê azadiya gelê me da, nişani me dîde.

Despêka rojên baharê da, dî nav gelê me da, pirozkırına cejna Newrozê, ji bo rojên xweş, daxwaz û hêviyêن gelê me diyar dîke. Geleki naxwaze wunda bibe û geleki rojên xweş hemêz dîke, bî baweriya me tu hêz nikare lî pêşıya vê meşê bigre. Hêzên zordest bî vê-nevê wê binkevin. Dirok lî ser mîlên gelên cihanê diherike, ew pêştacûyina cîvaki tayin dikin. Hemû zincirêن ku pirozkırına Newrozê qedexe dikin, rojekê ji rojan wê bîşkên. Ev baweriya me, wek hêviya dî helbestê Paplo Neruda da, helbestê bî navê "Strana Ge-nim" wusan jendar û xurte:

Gelê min, ez bî tiliyan va nayêm jîmartın!  
Di dengê min da hêzek dibirige  
Di tariyê da bejn dîde  
Bêdengiyê dîqelêşe  
Miri, mîrxas, si û bûz, çi hebe  
Wek tov dîkeve axê  
Û gel dî erdê da çal bûye  
Tov lî cîheki maye  
Genim çawa bejn dîde  
Derdikeve lî ser rûyê erdê  
Bî destêن bedew û sor va  
Dîqelêşe û qul dîke bêdengiyê  
Em gelin, carke din dizêن ji nav miriyan.

Cejna Newrozê, bî rengeki "Cejna Bahar û Azadiyê", dî nav tevgera pêşketîna gelê me da wê roleke hin ji mezîn bîlize. Cejna Newrozê keriki çanda cihanêye, pirozkırına Newrozê û roja dîji nijad perestiyê, çawa tê zanin 21 Adarê da berhev ketîne, vê yekê kema-la Newrozê hin ji zêde kiriye. Rojekê, dî şeveresa berbangê da gelê me, wê stranê serketinê va derkevin kuça-kolanan tiji bikin, ev şabûna rîzgariya gelê me, wê cejna Newrozê hin ji bixemiline.

---

# VEKOLİNEK LI SER DESTANA

## Zembilfıros

Sala par ji aliyê redaksiyona edebiyata rohilatêye sereke ya weşanxana "Nayka" (Zanistî) da pirtûka kurdzana Sovyet Jakelina Museliyana hat weşandîn. Ev pirtûk bî sernîvisara "Zembilfıros: Des tana Kurdi û şaxên wê yê folklorê" çap bû.

Beyt- Serpêhatiya Zembilfıros, bingeheki zargotina kurdaye, Gel, pîr jê hezkiriye, wek beyt- serpêhatiya "Memê û Zinê", "Üsivê Neviya", "Leyl û Mecnûn" û ên mayin. Lî hetani van dawiyân ji ew baweri hebû, weki "Zembilfıros" tenê nava zargotina gel da heye, lî ser veçekirina wê ya edebi tu tişt diyar nin bû.

Bî saya koleksiyonê destnîvisarê kurdi, ku pîsporê ûris Alek-sandır Jaba li Tîrkiyê berevkiribû, hate diyarkirin, weki ev beyt Serpêhatiya delal ne ku tenê dî nav gel dabî zarbelav bûye, lê wusan ji şaxên wê yê edebi hene. Eva yeka, nişan dîde ku gel guh- darike mezîn daye ser vê serpêhatiya "Zembilfıros".

J. Museliyana ew daxwaz daniye pêsiya xwe, nava vê xebata xwe da çawa şaxên vê serpêhatiyê yê edebi, wusan ji şaxên zargotinê analiz bike, gîringiya wê dî nav edebiyata kurdi da nişan bide.

Dî naveroka vê beytê da, çawa şaxên edebi, wusan ji şaxên folklorê wek hevin.

Jîna mir ser meriveki kesib, ku selîk û zembil çê dikirin, ku bona aboriya (deb) neferê mala xwe bike, ew difrotin, bengî dîbe, dîlê wê dîkeve wi. Xatûn her mecalê bî kar tine, ji bo dîlê Zem-bilfıros bikire, lê Zembilfıros guh nade huba wê. Ji wi ra, kesibi, mala tiji û neferên hûr hin ji hêjane, ne ku birca xatunê zêr û zivên wê.

Naveroka vê beyt- serpêhatiyê tevlîhev nine, bî taybeti lî vi-ra du mîrov pêsta tê, Zembilfıros û xatûn. Nigarê mayin car-ca-rîna dîbin û her tenê nigarêne sereke didîne tamkirinê, çawa şax-en edebi, wusan ji ên folklorê geleki kurtin. Bawer bikin serpê-hatiya Zembilfıros ya lape (here) kurte dî nava zargotina me da.

Bingehêne vê serpêhatiyê, çawa zanayê rast tê derxîstiye, dîja-yetiyyê (dubendi) cîvaki û exlaqine. Lî vîra peywendiyê senetka-rê sade, bî jîna mirê dewlemend, şerkariya bona helaliyê, baweri, paqıjbûn û rasti hatîne diyarkirin. Qewmandînen vê efîrandînen bî taybeti tiştîki diyar dîke. Serketîna rastiyê lî dîji qelpiyê û serketîna qencyê lî dîji xîrabiyê.

Dî vê pirtûkê da, Jakelina Museliyana çawa şaxên edebi, wusan ji şaxên folklorê dane çapkirinê, wergerandiye ûrisi. Gelek şaxên serpêhatiyê, ewê bî xwexwe jî nav kurdîn Ermenistanê û Tîblisê berev-kiriye.

Di vê xebatê da Museliyan ciheki fîreh dîde pêştahatina temaya "Zembîlfîroş". Zaneyê pirtûkê dibêje weki, temaya serpêhatiya Zembîlfîroş heveki nêziki serpêhatike pirtûka "Hezar û Yek Şev'e. Ev yeka, sertaca edebiyata rohilata ereba, tine bira mirovan. Lê mirov nikarê vê yekê bî mérani bide ispatkîrinê, ew dînivise, çimki weşandinê wê pirtûkê da cara pêşin ew serpêhati tunebûye, ew pêsta hatiye di sedsaliyên 17-18'an da.

"Geleki dijware mirov bide xuyakîrin", J. Muselyan dînivise, weki çi wexti naveroka Zembîlfîroş di nav kurdan da hatiye rîstînê. Lî, em bî xurti dikarin bêjîn, weki, hebûna wê di nava kurdan da dîghêje çend sedsaliya û hesab dibe efrandîneke kevn.

Zana ser wê baweriyêye, weki eva serpêhatiya bî taybeti di sedsaliyên 15-16 an da, di nav kurdan da belav bû, dema di nav dewleta Osmani da begti pêsta hatîn, bajar hatîne sazkîrinê, huner pêsta çû. Eva efrandîna edebî, lî ser sazkîrina bajaran, lî ser rewşa wê demê, efrandîneke pêşin û tek-tenêye, di vi ali da gîringiyâ wê geleki mezine.

Cara pêşin nîviskar dînivise, kurdzan di kutasiya sedsala 19'an da bî vê serpêhatiyê va mijûl bûn. Di sala 1870 da A. Sosin, lî Kurdistana Tîriyê nîvisarêne wê berevkîrin û du şaxê Zembîlfîroş nî visin û nasiya Ewrûpê da wan. Bî vê serpêhatiyê va wusan ji gelek kurdzanê mayin mijûl bûn.

Tıştê hewaskar ewe, nîviskar dibêje weki cudatiya şaxê edebî, û yên folklori, ku ji cihêna cuda -cuda hatîne berevkîrinê, geleki kême.

Nîviskar, xebateke mezîn kiriye bona van hemû nîvisaran hemberi hev bike, van herdu şaxê edebî û folklori cihê bike, analiz bike, çap û kafiyê wan tespit bike, rexneyan lî ser serpêhatiyê amade bike û wê wergerine zimanê ürîsi.

Di vê xebatê da J. Muselyan ciki mezîn daye şirovekîrinâ vê pîrsê, weki kiye xudanê serpêhatiya "Zembîlfîroş" ya edebî. A. Jaba, dînivise, weki ev serpêhatiya di sedsaliya 15'an da bî destê helbestvanê kurd Melleyê Batê, hînek ji dibêjîn, weki ew ya Feqiyê Teyrane (sedsaliya 14).

Bona vê yekê bide ispatkîrinê, J. Muselyanê efrandînen van helbestvanan û şaxê serpêhatiya Zembîlfîroş hemberi hev kiriye, lînîhirandinê ziman, çap û kafiyen daye pêşberi hev. Nîviskar û zana lî ser wê baweriyê dîsekîne, weki serpêhatiya Zembîlfîroş ne ya Melleyê Batêye, ne ji ya Feqiyê Teyrane. Ew ya helbestvaneki mayine, ku di sedsaliya 15-16'an da jiye, wek Melleyê Batê û Feqiyê Teyran ji hêla Çolemergêye, ku navça edebiyata kurdi bû, yek ji wan gelek peyketiyê Feqiyê Teyrane, ên ku efrandînen xwe lî ser navê wi dînivisin.

J. Muselyan dînivise, weki niha bî rûyû tunebûna melûmetiyêne hewcedar da pîrsa xudanê şaxê serpêhatiya Zembîlfîroş yên edebî, vekiri dîmine.

Bî gîlikî xebata J. Muselyan pêk aniye pîr hêjaye û keda wê berbiçave di nava pêştabırına kurdzaniyê da.

BABAYÊ KELES

# DU GİLİ LI SER PEYVÊN SİNONİM

Prof. QANADÊ KURDO

Dî hejmara çaran da ya kovara ROJA NÛ da nîvisarek lî ser peyvên wekhevi çap bûye. Navê wê nîvisarê "Listeke peyvên sinonim" e. Xwedînîvisê wê nîvisarê heval û hevkarê delal ROHAT e. Bi rasti bêjîm, çaxê mîn ew nîvisar xwend, kêfa mîn xweş bû, dîlê mîn pê şâ bû, ku dî nav xwendekar û xwendevanê kurd da mezîn hene, serwext û şarezane, bî rînd û xiret dîfikirin. Ew nîvisarêna baş lî ser pêşvabırın û yekitiya zîmanê kurdi da dînîvisin, qasi feraset û zanina xwe nîvisarêna kîrhatî û sûdmend lî ser zîmanê dayka xwe dînîvisin.

Dî lista peyvên sinonim da heval Rohat heta sed peyvên wekhevi nîvisine. Bi fîkra mîn, bî ramana mîn, eva nîvisara cara pêşine, ku têda pîrsa komkîrin û çapkîrinâna peyvên kurdi yêñ sinonim tê dani-nê. Dî zîmanzanîna kurdi da heta niha keseki eva pîrsa pêşta ne aniye û qet gîlik lî ser sinonimê zîmanê kurdi nenîvisiye.

Hevalê Rohat rast nîvisiye, ku heta niha ferhenga sinonimê zîmanê kurdi tune, bona ku ew hebe, lazîme peyvên wekhevi kom bîkin, çap bîkin. Raste, komkîrin û çapkîrinâna sinonimê kurdi, ji aliki da nişan dike dewlemendiya zîmanê kurdi û yekitiya zaravêni wi, ji aliki dîn da, ew kar dîbe kaniya pêşvabırın û pêşxistîna zîmanê edebiyata kurdi niha. Bo vê yekê heval Rohat dî nîvisara xwe da nîvisiye... "Jî bo berevkîrinâna peyvên cuda-cuda xwendevanê me dî karin hin ji serê xwe bêşinîn, ji bo berevkîrinâna çand û ji bo ve-kolina bîngehêñ zîmanê kurdi, berpîrsiyariyêñ nû hîldîn ser mîlêñ xwe, heta ku ferhenga sinonima bi zîmanê kurdi hat amadekîrin". Evva gotîna bî sed cari raste, lê dîvêt bêjîm, herdem pêwîste nîvisarêna lî ser peyvên sinonim dî zîmanê kurdi da çap bîkin û lî rex wan şîrovekîrinâna maniya wan nişan bîkin, bînîvisin filan peyva sînonim lî nav kijan zaravê kurdi da bî pîrani tê bîkaranînê. Disa pêwîste fîkîr, mani û xebitandîna wan bê gotînê û nişankîrinê. Wusa bîkin ku şaşiyê nekin nav xebata xwe. Bona vê pîrsê lî vîra ez mecbûrim du-sê gîliyan lî ser nîvisara heval Rohat bînîvisim.

Nîvisar bî temami raste, başe, lê, dî nav lista peyvên sinonimê wi da sed car heyf û mixabin lî ci-cîna hîne peyv ku lî rex hev hatîne nîvisandinê, ew bî maniya xwe va ne wek hevin, fîkra wan cudaye, mesele lî rex hejmara 32'an da nîvisiye "Fîravin, taştê, xwerî" peyva fîravin, ango xwarîna nanê nîvro, peyva "taştê" ango xwarîna nanê sîbê, peyva "xwerî" ne taştêye ne ji fîravune, peyva "xwerî" ango tîstê xweri. Dî zîmanê kurdi da peyva xuri heye, ew nişan dike merîv sîbê taştê ne xweriye, xuri maye, bî xuri ci-xarê dîkşîne. Bi fîkra mîn wusan ji lî rex hejmara 37'an da maniya peyvên "Hêja, gîranbîha, berketi, delal" ji hev dûre. Disa lî rex hejmara 57'an da maniya peyvên "Nebez, têkoşer, mîrxas, bawer mend" ne mina hevin. Lî rex hejmara 21'an da çar peyvên yekmani hatîne nîvisandinê, lê dî nav wan da peyvek esmaniye (abstrak), sê peyv yêñ berbiçavîn (konkret). Ew herçar peyv evin: "Çavnebarî, dexes, kumreş, çavteng" eger lî cihê çavnebarî nîvisandi bûya "çavnebar" fîkîr û maniya wê nêziki peyvên dexes kumreş û çavteng bûya. Wusan ji eger lî paşı peyva "çavnebarî" peyvên "dexesi, kumreşî çavtengi, hatîbûna nîvisandinê hîngê maniya wan mina hev bûya.

Şaşî û kîmasiyêni vi cureyi lî çend cihêni dî lista peyvîn sinonim da rasti me têni. Lî, bî temami têda peyvîn yekmani hatine nişankirinê. Lî paşî vi kari destpêkiri, kîrhatî pêwiste xwendevan, rewşenbir û xwendekarêni kurd karê komkirin û çapkırına peyvîn sinonimên kurdi dom bikin. Bona vi kari lî pêşiyê pêwiste di kovaran da listêni peyvîn sinonim yên kar û barêni merivan, yên jîyin ayin û pêşen wan cure-cure bêne komkirin. Lî rex vi kari da dîvêt nîha da, jî dest pê bikin peyvîn sinonim jî cure-cure ferhengên kurdi hilçinîn û listêni wan bere-bere çap bikin, ku lî paşê kari-bîn ferhenga sinonimên zimanê kurdi çap bikin.

### LI ELMANYÊ ŞANOVANEKİ KURD



Şanovan (listikvanê Tiyatorê) İ.Atmalî bî xwe kurde û nîha li Elmania Rojava dîmine. Dî warê şanoyê da gelek pêşketiyê û jêhatîye. Bî taybeti, dî warê şanoya bêdeng (pandomin) da İ.Atmalî bala gelek kesan kışandiyê ser xwe. Beri çendeki li Elmania Rojava wi bî rejisoreki Elman, bî navê Achim Karp va listikeke bî navê "Traumland" (Welatê Xem-Xeyalan) pêşkêsi gel kîr. Gelek rojnamên wê hêlê li ser listikêni İ.Atmalî bendêni qenc nîvisin û li ser jêhatiyêni (maharet) wi sekînin. İ.Atmalî nîha ji, li ser listikeke dîn dixebîte, navê wê "6 seet Li Bal Polisê Biyaniyan" ye. Dî vê piyesa xwe da İ.Atmalî dixwaze problem, serêsi û derd-kulêni karke-rêni bîyani li bal polêsên Elman, pêşkêsi gel bîke.

# Rûpelek Jî Dirokê: *Mestûre*

Diroka gelê kurd dide kîvşê, weki dema kurdan xwestiye mirtiyê pîr-hindiki serbixwe avakîn, lî wan mirtiya, jina çandi ges bûye. Niveka sedsalya XIX pêşin lî Kurdistanê hê çend mirti hebûn, yê e ger serbixwe nêbûn ji, bandûra mêtropola, imperatoriyê Osmani û Iranê ser wan lap kêm bû. Jî wan mirtiya bûn: Botan û Behdinan, So ran, Baban, Erdelan, mirtiya Rêvandûzê û hînekê mayin. Seva wê dew ranê bî gulvedana nîvisandina helbestan û diroknûsyê bî taybeti mirtiyên Erdelan û Baban berbiçavîn.

Lî salnamên helbestan wê dewranê em rasti navê helbestvanê jî mirtiya Erdelan Mirze Mûrtaza Afsar Kurdistanî, Asadalax Beg Emiri Sînê Erdelani, Ekber beg Kurdistanî, Husêن Qulixan Sênenêdêci têن. Hema hîngê ji lî mirtiya Baban dijin û dînivisin helbestvanê nav û deng Ebdurehman beg Selim, Mistefa beg Kurdi û Mele Hizra Nali.

Cêrga van nava da ciyê xweyi hêja dîgre helbestvan û diroknûsa pîr jêhati Max Şeref xanîm Kurdistanî, ya ku nava edebiyatê da bî navê Mestûre hatiye naskîrinê.

Mestûre sala 1805-a lî Paytextê mirtiya Erdelanê, bajare Sênenêdêcê jî diya xwe bûye, dema wîra Emenalax xanê zor mirti dikir. Da marê wê da xûna du malbatê Erdelanêye zor dîkîsiya, jî aliyê dê xûna wezirê bî nislet, lê aliyê bavê malbata Qadiya. Malxalanê Mes tûrê lî şerkariya bona mirtiyê, roleke mezîn dilistin. Lê malbava nê wê pîrsê wusan da hemdê xwe bûn.

Bavê Mestûrê, Ebdûl Hesen Beg, merîveki bona dewrana xwe geleki xwandi, xwe jî karê mirtiyê dûr dîgirt, ewi bêtir guhdariya xwe dîda ser zarê xwe, bî taybeti keça xweye mezîn Mestûrê, bî kijanê ew kubar dibû.

Tornata kurdaye Kurdistanâ Rojhîlatê, dereca perwerdekîrinâ keçan da wê demê çav dîda Têhranê. Sitya kurd gere bizanbiya baş bistirê, bireqise û hespa bajo.

Lê Ebdûl Hesen beg beri gîsti guh dîda perwerdekîrinâ zaroyê in têlîktûal. Ewi hızkırına berbi xwendinêye, ku bal Mestûrê jî zîkma kiyê dîhat, hê ges dikir.

Rûpêlê diroka Kurdistanêye bî mîrxasi û comerdi va tiji, destan efsane û stranê lî ser mîraniya kal bava da, bandûreke mezîn ser Mestûrê dîhêlin. Lê diroka Kurdistanê bona Mestûrê tenê rûpêlê kî têbê diroknûsa, Ebdûl Hesen beg keça xweye hızkırı gund û bajar, çiya û baniyê Kurdistanê dîgerandin, kela û bîrc, koşk û serayê mirê kurda nişani wê dîkirin, yê ku dîjminê kurdaye sedsala, hukumdarê Iranê û Romê wêran kîribûn.

Ev ditîna, tevi melûmetiyê diroknûsa bal keça dîlsoz xastîna pêşdabırına wi kari diyar kîrin, weki bî xwe pêñûsê hîilde, çi ku pêşiyê wê nîvişkan hiştine bîne sêri, diroka Kurdistanâ Erdelanê tam bîke. Lê ewê ew kar tenê pey mîrkîrinê destpêkîr.

Mestûrê dawiya sala 1826-a, yan ji destpêka sala 1827-a mîr dîke. Beri mîrkîrinâ wê, mirê Erdelaneyi xort Xosrov-xan Bani Erdelan mala Qadiya tê xezevê. Bav û kalkê Mestûrê davêjine gîrtigehê wana bî 30 hezar tûmani cîrm dikin. Pey berdana wana xanê xort Mestûrê dive herêma xwe û bî vê zewacê tê bêji mirê Erdelanê û ma la Qadiyaye zor hev hatin.

Mestûrê ne jîna Xosrov xane tenê, ne ji ya pêşin bû. Jîna Xosrov xane pêşin, ku heta mîrina xan ji ya mezîn ma, ew Husîn Cihan xanîm bû, keça Fetx Eli şah.

Raste Mestûrê ra zar nebûn, lê ew mîrkirîna xwe da bêbextnînbû. Çawa bî xwe dînîvise Xosrov xan geleki wê hez dîkîr û ew malêda hatîbû naskîrinê, çawa seroka para jîna. Mestûrê heta mîrina xanê bêwext ji ma jîna wiye hîzkiri. Pey mîrina mîr, sala 1835-a ew kul û kedera dîlê xwe gele êlêgyada dîde der.

Bona jiyina xweye, salê pey mîrina mîr, ji 1835-an heta çûyîna Silêmaniyê sala 1846-an, Mestûrê diroka xwe da tu tiştî nanîvise.

Lê derheqa rewşa wê da em ji helbestê wê pêdîhesin. Helbesteke xwe da ew dînîvise: "Serê meyi ku hêjayî tace, em bin çarşeva da vedîşîrin, lê çi feyde weki bextê min ez wusan nimiz kîrim". Vîra da em wusan ji gazîna seva bindestiya jînan dîvinin.

Sala 1846-an hêzê şahê İranê yêngî çekdar davêjine ser Erdelanê, mir Rîza Quli xan, kurê Xosrov xani ji Husni Cihanê hêsisir dîkin û dîbin Têhranê, mal û nefera şereder dîkin û berê wana dîdine mîrtiya Baban, bajarê Silêmaniyê. Lî Silêmaniyê Mestûrê mala kurê a-pê xwe da dîhêwîre, yê ku bî xemxurike mezîn berbiri Mestûrê dîve. Lê ev xweşî ji dîrêj dom nake. Zûtîrkê kurapê wê ji gîran nexaş dîkeve dîmre û cara pêşin em li rûpêlê diroka Mestûrê a rasti gazi-nê ji tenêbûnê têñ. Çend roja şûnda kanûna sala 1847-a, 42 saliya xwe da, ji welêt, bajarê hezkiri, ji dost û pîsmama dûr Mestûrê ji serê xwe dani. Ew jîna nav û deng li gorîstana Girdi Seywan, nê ziki paytextê mîrtiya Baban, bajarê Silêmaniyê çel dîkin.

Kurdzana Sovyetê Evgênya Vasileva, ya ku nîvisara Mestûrêye derheqa diroka Erdelanê werdigerine zîmanê ûrîsi, gotareke xwe da dînîvise, weki beri Mestûrê li Rojhilata Nêzik û Navin ne nava ereba da, ne farsan da, ne tîrkan da, ne ji ermenyan da helbestvan û dirokñûsê jîne wusan tune bûne. Lê zaneki farsayı dema Mestûrêyi nav û deng Rîza Quli xan Hidayet Mestûrê nav dîke "Jîneke wê demîye here nav û deng".

Pey mîrina Mestûrê 80 sali şûnda, sala 1927-a bî xemxurya Pêşwitiki çanda gelê kurd Yaxiya Marifat diwana helbestê Mestûrêye farsi têne çapkîrinê. Diwanê da 2000 beyti zêdetir cih bûne. Lê e va tenê pareke poêzya Mestûrêye, ji ber ku gele helbestê wê demâ xwe da nehatîne berevkîrinê û wunda bûne, paşê ji ewê tevi zîmanê farsi wusan ji bî zîmanê kurdi zaravê gûrani helbest nîvisine. Vê diwanê da 181 qezel, 29 rûbayi, wusan ji çend mesnevi û qasida cih gîrtiye.

Helbestê xweye farsida Mestûrê kevneşopyê (edetê) poêzya farsaye kîlasik pêşda dîve. Piraniya helbestê wê yê evintiyêne, ewê avitîne ser mîrê xweyi hezkiri, Xosrov xan. Helbestê Mestûrê bî nexş û nîgarê nazîk, bî didemê poêtikyêye geş va hatîne nîtîrandînê, ewana bî hostatîke gîhiştî hatîne nîvisarê.

Pêşgotîna diwanê da Yaxiya Marifat dînîvise, weki pêşdahatîna helbestvaneke wusan wê demê da, ya ewqas mezîn, ewqas bî jêhati ewqas zane, dikare bê ditinê çawa ecêveke sîrûştê.

Çawa me jorê got, Mestûrê xên ji poêzyê wusan ji dirokê va mîjûl bûye û pey xwe "Diroka Erdelanêye" gîranbihâ hiştîye. Dirokza nê İranê Nasîr Azadpûr ew nîvisara Mestûrê sala 1946-a li Têhranê çapkîriye.

Navê helbestvan û dirokñûsa niveka sedsalîya XIX pêşin Mestûrê navâ diroka çanda gelê me da ciyê xweyi hêja gîrtiye û mirata gîranbihaye, ku ewê pey xwe hiştîye bendi lêgerineke fireye dî warê zanîstiyê da.

# NEWROZ -1984



Lî derwayi welat isal cejna Newrozê li gelek navçan da bî dîl-şahi hat pirozkîrin.

Lî Elmanya Federal, Federasyona Komelên Karkerêñ Kur-distan (KOMKAR) çar şahiyêñ mezin lî bajarêñ Duisburg, Hamburg, Mu-nih û Berlina Rojava amadekir. Dî van herçar şevanda nêzkaya 10000 kes besdar bûn, tenê dî şeva bajarê Duisburgê da 4000 kesan berna-na şevê guhdar û mîze kîrin.

Dî warê xebatêñ çandi û huneri da bî rasti ev herçar şevêñ KOM-KAR ê gelek hêja û rengin derbaz bûn. Bî sedan stran hatin gotin, bî dehan komêñ folklorê besdar bûn, dengê tenbûr, def û zîrnê ne hate bîrin, dengê sazbandan, stranêñ azadiyê, aşiti û xweşiyê dî van herçar şevân da bî hezaran guhdar û nêhîrvan kêfxwêş kîrin. kîfa wan gelek bî van şevan hat. Dî van şevan da gelek dengbêjan cih girtin, Şîvan, Melike Demirax, Sumeyra, Feqiyê Teyran, Şêxo, Nuro, Kemal, Eli, Delal, Xerib... Komêñ folklorê (ji 20 kesan pêk hatine) listikêñ lî hêlêñ van bajarêñ jêrin pêşkêsi mîvanan kîrin, Entep, Wan, Xerput, Muş, Bingol, Bitlis, Agırı, Adiyeman û Diyarbekir. Ji aliyê dîn, wek şano, xwendîna helbestan, koro, folklorêñ Yewnan û Şiliyê gelek xebatêñ mayin ji dî van şevan da, ji mîvanan ra hatin pêşkêskîrin.

Çawa lî Elmanya Federal, wusan ji gelek welatêñ mayin lî Ewrû-pa şahiyêñ Newrozê bî hevra hatin pirozkîrin. Lî Swêdê, Federasyona komelên Kurdistan, lî Holland Yekitiya Karkerêñ Kurd, lî Yewnanistanê 8 rêxistinêñ kurd û tîrk û lî Danimark ji Yekitiya Karke-ran berpîrsiyariya pirozkîrina van şahiyâ hildan ser milê xwe. Bi hezaran kes ji tevi van şahiyâ bûn û cejna xwe bî dileki şa, bî çâ-veki bîlind û bî hêvíke xurt va pirozkîrin.

İsal ji, lî Suriyê lî cîgeh û warê kurdan Newroz bî serbesti hat pirozkîrin. Lî Qamışli, Kobani û bajarêñ dînê, her wusan ji, lî Sa-mê Newroz bî şahiyêñ xurt derbas bû. Lî Qamışli û hîn ciyêñ dîn Kurd, baweriya wani siyasi cuda-cuda be ji, hemû bî hevra derketin lîçolê û cejna xwe bî hevra pirozkîrin.

# Niviskareki Nemir

## ŞOLOHOV



Mikayil Şoholov di sala 1906'an, di nav dengê pêlên çemê Donê da çavê xwe li dinê vekîr, lawê gundi Aleksandır, zaroktiya xwe li ber çemê DON'ê derbaskîr.

Şolohov di 18 saliya xwe da dest bî nîvisarê dîke, cara pêşin nîvis û serpêhatiyêni wi, di kovar û rojnamêni Komsomolê da çap dîbin. Di nav van salan da şereki dîjwar û çetin dajo, Şolohov tevi şer dîbe û dîbêje ku : "...Ji sala 1920 an şunda ez li hêla Donê xebitim, ser axa Donêbihust-bihust geriyam, demeke dîrêj ji bo destxistina zêde çek (silah) û xarinê min kar hilda ser milê xwe. Heta sala 1922'an yêni Don xistibûne bin destê xwe, şerê me û wan ajot. Min heta wê salê bî mérani êrişî ser dîjmîn kîr. Hemû tîşt bî daxwaza me pêşda dîçû, min gelek derd û kul ditin."

Di sala 1926'an da pirtûka Şolohov ya pêşin tê çapkîrin, navê wê "Çiroka Donê" bû. Dû ra "Stepêni Hêşin" çap dîbe. Niviskar di van pirtûkan da bî taybeti li ser şerê hundur, despêka Ekonomi-Politika Nû (NEP), rewşa Kazaxan, dîjayeti û peywendiyêni wan yêni cîvaki, dîsekine.

Şolohov, bî taybeti bî pirtûka " Ü Bêdeng Dîkîşıya Don" va hate naskîrin, heta wê çaxê navê wi zêde belav nebû. Bî weşandîna vê pirtûkê va, navê wi carekê li dinê belav bû. Ev româna, paşê bî gelek zîmanan çap bû,

Paşê, Şolohov romanekî dîn bî navê "Erd-Axa Hîşyarkiri" nîvisi. Şolohov wek româna pêşin, vê româna xwe ji bî jiyana gundiyyêni Kazax va dixemiline. Di vê romanê da niviskar bî çaveki zanisti, lêkoli nekê li ser şer û rewşa Kazaxan pêşkeşî xwendevanan dîke.

Çawa tê zanîn di sala 1929-30'an da kollektivizasyon di nav jiyina gelê Sovyet da ciheki mezîn dîgre, dîbe bûyereke mezîn. Ev pîrsa, di romanen Şolohov da pîrseke bîngehîne û di romanen wi da bî zanisti hatiye şirovekîrin.

Pey vê dema dîjwar, şerê dînêyi duwemin dest pê dîke, Nazyîen Elman êrişê dîbîne ser welatê aşiti û azadiyê. Şolohov yek-du na-bêje xwe davêje nav pêlên şer û lî dîji naziyan şer dîke. Şolohov ser vi şeri romana xwe ya "Bona Welat Mîrin" dînivise. Dî vê româ-nê da nîvîskar bî taybeti lî ser şerê çinayeti lî dîji neyarêna za-lîm dîsekîne, bî zareki dîramatik va bîngîhêne diroka wê demê dikô-line.

Şolohov tenê ne nîvîskarê şere, aşiti û xweşî beşike firehe dînaveroka efrandinêni wi da. Jî ber van hemû xebatêna xwe, dî sala 1965' an da navê Şolohov hêjayî Xelata Nobelê dîbe û ew vê xelata mezin digre.

Şolohov çawa dî warê nîvîskariyê da, wusan ji, dî nav politka-yê da, bî aktif kar kiriye. Ew dî sala 1932'an da kete Akademiya-zanisti û bî serfirazi qedand. Disa dî wê salê da dîbe endamê partiyê. Dî sala 1961'an da, ew dî komita merkezi ya Partiya Komunist-a Sovyet da cih digre. Heta roja mîrina wi ji, ew endamê komita merkezi bû.

Şolohov, dî roja 20-2-1984'an, dî 78 saliya xwe da çû ser he-qiya xwe.



سازمان  
نیوشا

## 75 Saliya Casimê Celil

Nîvîskar û helbestvan Casimê Celil, dî roja 27-2-1984'an da kete 75 saliya xwe. Li Eriwanê Mala Nîvîskaran da, jî ber tijikirîna 75 saliya Casimê Celil cîvineke pirozbayiyê hat amadekirin. Dî vê şevê da gelek nîvîskar, rojnamevan, helbestvan, wergerwan, saz-bend, karker û gundi beşdar bûn.

Despêka şevê da, berpirsiyarê Yekitiya Nîvîskarênen Ermenistanê peyivi, Mikriç Sargasyan dî gotara xwe da, lî ser şexsiyeta Casimê Celil sekini û jî ber kar-xebata wi spasi wi kîr, ew piroz kîr.

Paşê, lî ser efrandinê wi, karêni wi, Wezirê Eşo deng kîr, ew kîye, çi kiriye, bî firehi Wezirê Eşo lî ser jiyyina wi sekini. Pey vê gotarê Karlanê Çaçan û serokê Radyoya Erivanê (beşa kurdi) Ahmedê Gogê piroziyêna xwe pêşkêş kîrin.

Çawa tê zanin Casimê Celil gelek helbest, serpêhati û çirok nîvisine. Wi gelek salan ji, dî radyoya kurdi da kar kiriye û dî warê amadekirine programêna radyoyê da keda wi pîr derbaz bûye.

# Biraninek Lı Ser APÊ SELİM

Ezê têkevime beri ava,  
Gula bîçinim, bavêm ser bînava  
Kêleka nexwaş, bîrindara rûnim, hêdi hêdi  
Têkme dermanê dîl-hînava

(Straneke Gel)

Apê Selim (Mustafa Budak) di roja 30-3-1984'an li bajarê Stockholmê serê xwe dani. Ew şorîşvaneki bî dîl şewat bû, 15 sa-lên jiyina wi di nav şer û tekoşinê da derbaz bû, heta roja mîri-nê ji, lî ser karê xwe bû, hêrsa xwe li dîji neyaran tûj dîkir û hêviya rojêñ xweş av dîda, ew bî enerjike xurt va tiji bû.

Bî rasti, mîrina Apê Selim em di nav şin-gîrîki mezîn da his-tîn, hevalêñ ku Apê Selim nas dikirin gelek berxwe ketin û baweri ya xwe bî mîrina wi ne anin, di çend nameyêñ lî ser mîrina Apê Selim da, ev baweriya xweş tê xuyanê:

"Ew nemîr, me ew di dîlê xwe da gor kîr, ewê, lî wir biji"  
(Esat, Şam)

"Ew, ji bo me ronahi bû, rêber bû, cihê wi nayê tijikirin, te koşina wi, ev tekoşina bî rûmet, hertîm di hisê me da wê biji..."  
(Hemze)

"Bî rasti, ew ne tenê kekê te (birayê Apê Selim) bû, kekê me hemûyan bû. (Ahmet)

"Ez sond dixwîm, lî cihê wi mîrina min bîhata xwestîn, mi-nê bî daxwaza xwe, bî rûken, ev yeka bîhaniya cih..." (Nurê)

"Min dixwast, ji destê me tiştek bê û me bavê xwe di şunda bîhaniya, ez bawer nakîm min bavê xwe çawa wînda kîr."  
(Zarokeki wi)

"Em çi bikin, têrê nake û têrê nake ji..." (Kasım)

Hemû ev namana ji bo serxweşiyê, ji birê wira hatîne şandîn. Hejmara van naman mîrov dîkare hin ji dirêj bike. Ev şin-giri, ev dîlşkestîn û berxweketîn, tenê bî baweriya me li ber mîrinê stû-xariya mîrovan nişani me nadî. Di nav vê şin-giri da mîrovhezi he-ye, mîrxasi, tekoşeri û camêriya Apê Selim heye, rûmeta wi li bal mîrovan hebû, mîrovan jê hez dîkir.

Mîrovêñ me bî xwe di şinan da, naxwazîn baweriya xwe, ji wîndakîrina mîrovan binin, dixwazîn wan di dîl û mîjûyêñ xwe da cih bikin, weki ew neyêñ birkirin û nemrin (camêri, mîrxasi û qenci-yêñ wan). Di şina Apê Selim da, dema keçek dîbêje, diya wi, weki werê cihê xwe da rûnê, neweste, diya wi bî serbilindi dîbêje ku "Keça min, hûn tevi karê min, nebîn, ev dilana kurê mine, iro ku-rê min êdi ji mal bar dîke, diçê maleke dîn, ez dixwazîm mîvanêñ kurê xwe ra xîzmetan bîkim". Eve, bî rasti filozofiya şina mîrovêñ mîrovhez. Beri çendeki di rojnamekê da min çend giliyêñ şoreşvane ki İranê xwend, rejima Xumeyni wê ev şoreşvana dardakîra, ew li ber sêpiyê benda van rojan bû, wi dîgote diya xwe: "Dayê, dema ewa-na (dijmin) deng nekin, nebêjin weki ez iro li kiderê gorkirime, paşı rojêñ azad tê min bibini di nav refen rûkenan da". Di wela-tîn bindest da, wek Kurdistanê, çawa tê xuyanê êdi dayik û zarok bî hevra singê xwe dîdine ber êrişen dijmin, topêñ wan....

Paşı mırına Apê Selim çend xwendevanêñ kovara me, lî ser Apê Selim jî me ra hin helbest şandîn. Jî ber zêdebûn û dîrêjbûna wan em nikarin van hemûyan biweşinîn. Dî nav van helbestan da, wek em dîbinin, Apê Selim dîji, rûkene, rûmeta wi bîlinde û xetêñ xweş lî ser wi da dibarîn, wek helbestvan Seydayê Keleş jî Suriyê den-gê xwe bîlind dîke:

*Weki şêr û pîlingen tîm xebatkar  
Gelek zana, mîr û xweş peya bû*

.....  
.....  
*Bî guman bû Keleş wê te bibine  
Lî cem mîn ditîna te pîr buha bû*

.....  
.....

Disa xwendevaneke me lî Stockholmê, bî navê İhsan Biçimli, wek lî jêr wusan dînivise:

*Apê Selim nemîr, Apê Selim nemîr  
Bî bir û baweriya xwe  
Jî me ra dîbe weke zînar û çiyayêñ. gîr  
Apê Selim yeke, Apê Selim yeke  
Esmânen şîn, jî baweriyêñ wi ra  
Gelek deriyan vedîke.*

.....  
.....

# LI TIRKIYE POLITIKA PERWERDEGARIYE:

## ZORDESTIYA LI SER KURDAN

*Organa weşani ya Sendiqâ Perwerde gariyê û Zaninê li navça Bayern GEW, di hejmara xwe ya Sebat 1984'an da, li ser rewşa zimanê kurdi, bî imza Horns RÜCKERT va, nîvisarek weşand. Ev nîvisara han, di kovara Dengê KOM-KAR hejmara 64'an da, bî wergera tîr ki bî kurtebiri hate weşandın. Em kur diya wê pêşkêsi xwendevanan dîkin.*

"Li Elmanya Federal, ji karkerên mîhacır, yênu ku em wek tîrk dîhesibînîn, ji sisîyan yekê wana bî etniki kurdin. Li Tîrkiyê, hukumatê tîrk li kurdan zordestiyê dîkin. Li Elmanya Federal ji, ew bî tîrkan ra tevayı bêrûmetiyê dîbinin û bî çaveki piçûk li wan tê nihêrandin..."

"Piştî 12 ilonê 1980, serwêriya generalan endamên TÖB-DER ê (Rêxistîna Mamosteyên Tîrkiyê) ji dîbistanan avêtin. Bi sedan ji wan avêtin zîndan, cezayên gîran li wan barandin; ew ji cihêwan dûrxistin. Sedemeki gîrtin û qedexekirina TÖB-DER'ê ji ew bû ku, wê mafê perwerdegariya zimanê dê, ji bona zarokên kurd dixwast.

"...Zimanê kurdi ji sala 1924'an-vîrda wek zimanê axiftinê qedexeye.

Lê ev qedexa han heta sala 1980 negi hiştiye serfiraziyê. Li hember vê, weşanên kurdi bî tevayı dî bin zordes tiyê da gîrtin. Qedexa li ser ziman, ku bî emîrnâma Ataturk va despêkiriye, iro bî kar tê anin. Her ki bî kurdi bîpeyive û xwe bîde dest, ew li gorzagona cezan hejmar 142 û benda 3'an tê gîrtin û cezakirin.

### LI ELMANYA FEDERAL

"Serwêrên elman, kurdan wek tîrk dîhesibînîn. Loma zarokên kurdan, di dersxanên tîrki da, bî zimanê tîrki dersê dîbinin. Bi vi awayi zarokên kurd, mecbûrin 2 zimanen biyani fîrbî bin. Elmani û tîrki. Fersenda xwendîna bî zimanê dê, ji bo zarokên kurd tuyeye. Ev ji li ber serfiraziya hinbû



nê û çêbûna şexsiyeta zarokan bî awaki qenc dîbe astengeke gîring. Li Elmanya federal, mamosteyên tîrk, ji ali yê hukumatê têne kontrolkirin. Ji wan perwerdegariyeke nijadperest û gili-kirina mamoste û şagirtên pêşverû tê xwestin. Hukumata tîrk, hemû navgin(alet) bî nijadperestiyê dadigre û pêşkêsi dîbistanan dîke.

Li hember vê perwerdegariya nijadperest, gelek caran ji jîber ku tîrki baş nîzanin, zarokên kurd, bî bêfehmi û bêkêriyê têne morkirin.

### LI SWED

Rewşa zarokên kurd li Swêd, ji bôdersên kurdi, pîrtûk û navginê din dide amadekirin û ji bo gihadîna mamosteyên kurd, di dîbistana bîlind da beşa kurdi vekiriye.

Ji bo rakirina dersxanen 2 zimana û yênetewi, ji bo pêkanina dersxanen ku zarokên biyani û yênetewi elman bî hevra besdar bibin, ji berê da GEW vê daxwaz dîke. Dîvê zarokên kurd, di dersxanen elmanan da cih bîgrin û herwusa xwediyê mafê dersen kurdi bin ku, di wan dersan da, zimanê dê û çanda xwe hinbin.

# Çirokek

ÇÜÇIK Ü İSTİRİ

NAVDAR

Rojek ji rojan çüçikek difire, diçe li ser sênceki datine. Li ser sênc datine, lê belê istiriyek di lingê wê da diçe. Çüçik disekine, difire û dibêje: "Ez vê istiriyê çawa ji lingê xwe derinim".

Çüçik disa difire, diçe nava gundek, li ser tendûrê datine. Pirekek ji, li ber tendûrê sekiniye, nan dîpêje, çüçik dibêje: "Xal ti, xalti ! tu xêra mîriyê xwe vê istiriyê ji lingê min derxi". Pirek istiriyê ji lingê çüçikê derdixe û davêje nava agirê tendûrê, istiri dişewite. Çüçik icar hêrs dibe, vê ali wê ali xwe erdê dixe, dibêje: " tuyê yan istiriyâ min, yan ji nanek bîdi min". Ji ber ku istiri şewitiye, pirek bê çare dîmine, naneki dide çüçikê.

Çüçika me difire-diçe rasti cotkareki tê. Cotkar pîr birçi bû ye, halê cotkar ne başe. Çüçik ji cotkar ra dibêje: "Cotkaro! halê te ne hale, han ji te ra vi nani bixwe!" cotkar nin dixwe û çüçikêra dibêje: " Xwedê û pêxember ji te razi be". Çüçik disa vê a li wi ali xwe erdê dixwe, dîke qirin û zarin, dibêje: " Cotkaro ! tuyê yan nanê min, an ji herdu gayê xwe bîdi min". Cotkar her çiqas eman-yeman, ev herdu ga her tiştên min in, dibêje ji, lê feyde nake. Cotkarê bê çare, radibe herdu gayê xwe dide çüçikê.

Çüçik herdu gayan digre û diçe. Pîr diçe, hindik diçe rasti siyareki tê. Dibêje: " Siyaro! karê min li Gund heye, pêwiste ez zû herim Gund, ji ber wilo ji, ez herdu gayê xwe bîdim te, tu ji hespê xwe bîdi min". Siyar bê gotin û xeber, qebûl dîke, hesp bî herdu gayan ra dighirine.

Çüçik hespê rewan siyar dibe, diçe nava gund. Dinhêre ku çi bînhêre. Dawete, dengê def û zîrnê tê, jîn û mîr, keç û xort keti ne destê hev, govendê dîkışının.

Mexrebeye, roj teze çûye avan. Çüçik diçe mala bavê bûkê dîbe mîvan. Xwediye malê dixwaze ji mîvanan ra gayek şerjê bîke. Lî be lê şûna ga da xeleti hespê rewan şerjê dîkin. Gava çüçika me pê dîhese, disa dîke qirin û zarin, dibêje: " Yan hûnê hespê min, yan ji bûkê bîdin min". Dê û bavê bûkê dibêjin: " eman-yeman ev çi belaye hat serê me, Xwedê ji te razi be, usa nabe". Çi dîkînakîn, çüçik qayil nabe. Bê çare dîminin, radîbin bûkê dîdin çüçikê.

Çüçik bûkê digre û diçe. Disa pîr diçe-hindik diçe, rasti şivaneki tê. Şivan pez berdaye beriyê, bî xwe ji li ber kevireki me zîn rûniştîye, bîlûrê lêdixe. Çüçik dîbeje: "Şivano! dengê bîlûra te ez kuştîm, kezeba min heland. Ez dixwazîm tu bîlûra xwe bîdi min, ez ji bûkê bîdim te". Şivan ji bî xwe li tiştîk usa dîgere, ku dest nakeve. Şivan hema bî lez cih da radibe, bîlûrê dide çüçikê û bûkê ji çüçikê distine.

Çüçika me ji li ber kevire ku şivan rûniştibû, rûdînê û li bî lûrê dixe.

Dibêje:

"Min istiriyek da bî nanek  
Nanek da bî du gayan  
Du ga da bî hespek  
Hespek da bî bûkek  
Bûkek da bî bîlûrek  
Lûr, lûr, lûr..."



### CİVİNA NIVİSKARAN

Pirtûkxana Qraliyetê (Kungliga Biblioteket), dî meha Adarê da, li Stockholmê, temâsegeheke pirtûkên niviskarêni mihacir vekir. Dî temâsegehê da pirtûkên niviskarêni kurd ji hatibûn raxistin.

Roja pêşin, niviskarêni mihacir, li temâsegehê kom bûn. Bi axiftina wezira mihaciran, Anita Gradin daxuyani hate vekirin. Gradin li ser rewşa literatura biyani li Swêd, rawestiya. Dî civinê da mamoste Cigerxwin û M.E. Bozarslan ji beşdar bibûn. Dema Gradin hate ber beşa pirtûkên kurdi, serokê Enstituya Biyaniyan xwast ku nasiya Cigerxwin û wê bide hev, lê wê bi rûkeni got "ez Cigerxwin nas dikim" û këfxweşi da Cigerxwin.

Vê Daxuyaniyê meheki dom kîr.

### KULİLKÊ NEWROZÊ

Şanoya (Tiyatro) bî navê "Listik vanê Gel" dî meha çûyi da şanok li ser Kurdistanê derxistin dîkê. Naveroka şanoyê ji aliyê şanovana tîrk Ayşe Emel û niviskarê kurd Mahmut Baksî da hat amadekirin. Ev şanoya bî navê "Kulilkê Newrozê" li Stockholmê hate listin û mehekê zêdetir a jot. Gelek nêhirvanê kurd, tîrk, swêd û kesen ji geleñ mayin ev şanoya nûh mîzekirin. Şanovana bî rasti gelek bi jêhati listin û kêfa nêhirvanan gelek bî wan hat. Zimanê şanoyê bî kurdi û tîrki bî du zimaninan va hatibû amadekirin. Dî naveroka şanoyê da, ji aliki da zordestiyen li ser gelê kurd û ji aliyê dînda ji ne xweşiyen burjuvaziyen piçûk û kesen çeprevi bî fîrehi cih girtin. Li ser wê şanoyê bî zimanê kurdi û swêdi pirtûkeke informasyonê ji hate çapkirin.

### Stockholm



# JI NAV WEŞANAN

## ZEMBİLFIROS

Kurdzaneke bî navê Jakelina MUSU LİYANE, xebata xwe ya lî ser destana kurdî "ZEMBİLFIROS" xelas kîr. Wê ji aliki da şaxen folklorik û edebî, ji cuda-cuda navçen Kurdistanê hemberi hev kiriye, ji aliyê dîn da bîngahê vê destana hêja vekolandiye û mîrxasê serpêhatiyê dîde nasin.

## LI SER KURDAN

Sazgeha Biyaniyan lî Swêdê (SIV) pirtûkek lî ser kurdan weşand. Niviskarê pirtûkê Alar Kuutmanne. Dî pirtûkê da , lî ser çand, dirok, ziman, edebî yet û rewşa kurdên lî Swêd hatiye rawestandin. Pirtûk ji 254 rûpelan û bî zimanê swêdi pêk hatiye.

## ZİNÊ

Lî Erivanê berevoka niviskar Karlanê ÇAĞAN, bî navê "ZİNÊ" çap bû. Dî nav pirtûkê da gelek helbest û serpê hatiyen niviskar hatine berevkîrin.

## BINHÊRE MADIKAN BERF DIBARE

Dî nav "Çapxane Çanda Kurdi" da pirtûkek nûh ji bo zarakan çap bû, navê wê "Binhêre Madikan Berf Dibare". Pirtûk ji zimanê Swêdi hatiye wergerandin.

## PARASTINA İSMAIL BEŞİKÇİ

"Parastina" İsmayil Beşikçi bî ber dadigehêن Türk, dî nav weşanê "Dengê Komal" da bî zimanî türki hat weşandîn. İsmayil Beşikçi bî dûr û dîrêj lî ser hebûn, çand, dirok û şerkariya gelê kurd dîsekine.

## HEYV LI ESMANÊ

## DİYARBEKIRÊ

Pirtûkeke helbestan, bî navê "Heyv Li Esmanê Diyarbekirê" lî Swêde hat weşandîn. Niviskarê pirtûkê Rojen Barnas, gelek helbesten welatpareziyê têda nivisandiye.

Lî Iraq'ê

## "SILAVEK BO DELALÊ"

Ev pirtûka helbestvanê kurd Xalid Husêن, lî Bexdayê hatiye çapkîrin. Dî pirtûkê da helbesten xweş hene û bî kurmanciyeke zelal hatine nivisandin.

## "QEVDÉK JI HELBESTÊN NALBENDÎ"

Niviskar Seid Dêreşî, lî ser jiyan û helbesten helbestvanê kurd Ahmed Nalbendi ev pirtûka han amadekiriye. Gelek helbesten Nalbendi têda ci digrin. Pirtûk lî Bexdayê hatiye çapkîrin.

## "SADIQ BAHADDİN NIVİSKAREKİ KURDE"

Lî ser jiyan û xebatên niviskar, Sadîq Bahaddîn, vekolineke hêjaye. Ji aliyê Dr. Bedîrxan Sindi da hatiye nivisandin.

## "MEWLIDA MELAYÊ BATÊYÎ"

Dî mewlidê da herusa Eqida İmanê ya hozanê mezîn Ahmedê Xanê ji cih girtiye.

## "SOREŞA DIMDIM"

Bî destê Cemil Ahmet-Zero Herki hatiye komkîrin. Diroka Dîmdimê, bî awaki zanisti têda hatiye şiroveki - rin.

## "CELALÊ EMERÎ"

Niviskarê kurd Casimê Celil, lî Sovyetistanê komkiriye û pêşgotinek jê ra nivisiye. Dr. İzeddin, M. Resol, ew ji tipên sîlavi wergerandîne ser tipên erebi. Pirtûk lî ser DIMDIM'ê hatiye nivisandin. Lî Bexdayê hatiye çapkîrin.

## "STRANÊT ŞAHÎ Ü DILANA"

Ahmed Abdula Zero û Xalid Husêن, tevda ev pirtûka folklorik amade kîrine. Têda gelek stranê dewat û dilanê kurdi cih girtine.

Berevkar: Salimê Casim

# ÇEND STRAN

NAVDAR

## EYŞOKÊ

*Eyşokê ha Eyşokê  
Eyşoka romani  
Şirinê şemamokê  
Destmala xortani*  
  
*Eyşokê çima çima  
Eyşoka romani  
Kulilka nav genîma  
Destmala xortani*  
  
*Fincana dest hakiman  
Eyşoka romani  
Xelq zewici, ez û tu man  
Zalimê tu dizani*  
  
*Eyşokê usa usa  
Eyşoka romani  
Kulilka nav garisa  
Destmala xortani*  
  
*Fincana dest mebûsa  
Eyşoka romani  
Xelk zewici em man usa  
Zalimê tu dizani.*

## DELİL XANÊ

*Ez ser banan, tu ser banan  
Delil Xanê, xana min  
Ez ser banan tu ser banan  
Dayika te qurbana min*  
  
*Bû çérina erebanan  
Delil xanê xana min  
Bû terpina zikirxanan  
Dayika te qurbana min*  
  
*Ez l' şemokê ku l' şemokê  
Kurtik sorê l' ser neynûkê  
Çıl zér dabû ser ceynûkê  
Dayika te qurbana min*  
  
*Ez sıvderê tu sıvderê  
Kurtik sorê ser mîzerê  
Çıl zér dabû ser kemberê  
Dayika te qurbana min*  
  
*Ez l' hewliyê tu l' hewliyê  
Kurtik sorê ser paniyê  
Çıl zér dabû ser eniyê  
Dayika te qurbana min*

## AX LÊ KINÊ

*ÊMA MIN ÊMIŞA MIN  
Hat karwanek vê Mûşê  
Êma min êmişa min  
Dani li rasta Erdişê  
Çavê reş bexşışa min*  
  
*Dani li rasta Erdişê  
Zendê zér bexşışa min*  
  
*Eyso Fato ez helandım  
Êma min êmişa min  
Kırime gulpa qayışan  
Çavê reş bexşışa min*  
  
*Hat karwanek vê dingê  
Dani li rasta Ziringê  
Eyso Fato ez helandım  
Kırime gulpa tifingê*  
  
*Hat karwanek vê derê  
Dani li rasta bêderê  
Eyso Fato ez helandım  
Kırime gulpa kemberê*

*Ax lê kinê lê lê lê  
Mala minê way way  
Ax lê kinê lê lê lê  
Emrê minê way way*  
  
*Ez ne kînim lê lê lê  
Ne dirêjim way way  
Tak rihanım lê lê lê  
Pel dirêjim way way*  
  
*Ez ne kînim lê lê lê  
Ne hûrikim way way  
Tak rihanım lê lê lê  
Pel hûrikim way way*  
  
*Ez ne kînim lê lê lê  
Ne mezinim way way  
Tak rihanım lê lê lê  
Pel nîzanım way way*  
  
*Ez ne kînim lê lê lê  
Ne biçükim way way  
Tak rihanım lê lê lê  
Pel biçükim way way*



1984

NEWROZ

BIHA: 10:- kr.